

**CERIBANDINEK LI SER SENIFANDINA MEWLÛDÊN KURDIYA  
KURMANCÎ LI GORÎ MIJARÊN WAN<sup>1</sup>**

**Hayreddin KIZIL<sup>2</sup>- Cemal ŞINGAR<sup>3</sup>-Ramazan ÇETİN<sup>4</sup>**

**Kurte**

Di vê gotarê de mewlûdên Kurdiya Kurmancî, bi awayê mijarên wan û riwayetên ku di van mewlûdan de tên bikaranîn, hatine senifandin û naskirin. Di gotarê de mewlûd di du beşan de hatine vekolandin. Di beşa yekemîn de me cih da mewlûda Bateyî ya ku mewlûda bi Kurdî ya yekemîn tê zanîn, herî zêde tê xwendin û herî baş tê naskirin. Dîsa di heman beşê de me cih dan mewlûdên li ber mewlûda Bateyî hatine nivîsandin. Di beşa duyemîn de mewlûdên ku ji hêla mijar û rîwayetên xwe ve resen (orîjinal) in hatin vekolandin.

**Destepeyvên sereke:** Mewlûd, Bateyî, ekola Bateyî, zaravayê Kurmancî.

**KÛRTÇE (KURMANCÎ LEHÇESİ) YAZILMIŞ MEVLİTLERİN  
KONULARINA GÖRE TASNİFİ DENEMESİ**

**ÖZET**

Bu makalede Kürtçenin Kurmanci lehçesi ile yazılmış mevlitler, işlenen konular ve kullanılan rivayetler esas alınarak tasnif edilmiş ve tanıtılmıştır. Makalede mevlitler iki kısımda incelenmiştir. İlk kısımda bilinen ilk Kürtçe mevlit olan, en çok okunan ve en fazla bilinen Bateyî'nin mevlidine yer verilmiştir. Yine aynı bölümde Bateyî mevlidi esas alınarak yazılmış olan mevlitlere yer verilmiştir. İkinci bölümde ise konu ve rivayetler bakımından özgün olan mevlitler incelenmiştir.

**Anahtar Kelimeler:** Mevlit, Bateyî, Bateyî ekolü, Kurmancî lehçesi

<sup>1</sup> Esl û kakilê vê gotarê ji alî Hayreddin Kızıl ve di kovara *e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*, Hejmar VII, sal: Nîsan 2012, r.116-150yê de hatiye weşandin. Me bi vê komxebatê bi awayekî serbest wergerand û bi kurdandin û lêzekerinê berfireh kir.

<sup>2</sup> Doçentê Alîkar, Zanîngeha Dicleyê, [hkhayreddin@gmail.com](mailto:hkhayreddin@gmail.com)

<sup>3</sup> Mamoste, MEB (Wezaretê Perwerdeya Netewî ya Tûrkiyeyê). [idilli\\_cemal@hotmail.com](mailto:idilli_cemal@hotmail.com)

<sup>4</sup> Mamoste, MEB (Wezaretê Perwerdeya Netewî ya Tûrkiyeyê). [msrcetin@gmail.com](mailto:msrcetin@gmail.com)

---

**TRYING OF CLASSIFICATION OF KURMANCÎ MAWLIDS ACCORDING  
TO THEIR SUBJECTS**

---

**Abstract**

In this study, Mawlid written in Kurmancî are classified and introduced according to their subjects and riwayaths used. In the article the Mawlidhs are considered in two parts. In the first part, Bateyi mawlidh, the first Kurdish and the most widely read one and the other mawlidhs written based on it are examined. In the second part the other Mawlidhs that are original in respect to subjects and riwayaths used are introduced.

**Key Words:** Mawlid, Bateyî, Bateyî School, Kurmanci Dialect.

**DESTPÊK<sup>5</sup>**

Merasîmên Mewlûdê, bi sedan salan piştî heyama Hz. Pêxember, ji bo pîrozkirina rojbûna/jidayikbûna Wî Cenabî hatine lidarxistin. Dîsa jî di nav hêmanên girîng ên ku bandoriya wan li ser oldariya civakê hene cih digirin. Ev merasîm ji heyama ku derketine holê û heta îro di nav misilmanan de bi sedsalan dewam kirine û li her derê ‘alema Îslamê bi heman awayî hatine pêkanîn (sepandin). Metnên (tekst) ji bo ku di van merasîman de bîn xwendin jî mîna van merasîman di nav gel de belavbûyî ne.<sup>6</sup>

Ji ber xwendina wan di van merasîman de, ev metin wekî “mewlûd” hatine binavkirin. Ji ber menzûmnivîsîna (helbestkî) wan, metnên mewlûdê ji berhemên din ên ku jiyana Hz. Pêxember vedibêjin cûda ne. Li ‘alema Îslamê bi gelek zimanan berhemên mewlûdê hatine nivîsandin.<sup>7</sup> Li ser van mewlûdan xebatên akademîk jî hene<sup>8</sup> lê li ser Mewlûdên bi Kurdî hîn ti xebatên bi vî awayî nehatine kirin. Biqasî ku me tespît kiriye li Tirkîyeyê, bi tenê M. Tayyîb

---

<sup>5</sup> Kurteyên di vê gotarê de ev in: bnr.: binêrin, bnb.: berhema navê wê bihurî, r.: rûpel, c.: cild, AÎD. : Ansîklopediya Îslamê ya Diyanetê/Diyanet İslam Ansîklopedîsî.

<sup>6</sup> Ahmed Aymutlu, *Süleyman Çelebi ve Mevlid-i Şerif*, MEB Yayınları- Weşanxaneyê Wezaretê Perwerdeyê, İstanbul 1995, r. 51-59.

<sup>7</sup> Ji bo listeya mewlûdên ku bi gelek zimanan hatine nivîsandin bnr. Necla Pekolcay, *Mevlid*, TDV- Weşanên Weqfa Diyanetê ya Tirkîyeyê, Ankara 1993, r. 26-29.

<sup>8</sup> Ji bo xebatên akademîk li ser mewlidên Erebi û Tirkî li Tirkîyeyê bnr. M. Edip Çağmar, *Edebi Açıldan Arapça Mevlidler*, Weşanên İlahiyatê, Ankara 2004; Pekolcay, *Mevlid*; Necdet Şengün, “Hz Fatîma Mevlidî ve Vesiletü'n-Necat İle Mukayesesi”; *Cumhuriyet Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi-Kovara Zankoya İlahiyatê ya Zanîngeha Cumhuriyetê*, c.XII, hejmar: 2, r.419-438; M. Tayyîb Okıç, “Çeşitli Dillerde Mevlidler ve Süleyman Çelebi Mevlidinin Tercemeleri”, *Atatürk Üniversitesi İslami İlimler Fakültesi Dergisi-Kovara Zankoya Zanistên İslamî ya Zanîngeha Atatürkê*, hejmar: 1, Erzurum 1975, r. 17-78

Okîç di gotareke xwe de navên sê Mewlûdên bi Kurmancî dane. M. Tayyîb Okîç, di xebata xwe de Mewlûda Kurdîzade Ahmed Ramîz, Mewlûda Molla Bateyî û Mewlûda Ahmed el-Xasî ya bi zaravaya Zazakî bi kurtasî dane nasîn. Dîsa di heman gotarê de wêneyên sereke yên her du mewlûdan jî bi ser ve kirine. Okîç, diyar dîke ku mewlûda Ahmed Ramîz a bi navê *Mevlîdu'n Nebiyy bi'luğati'l-Kurdiyye* li Misirê hatiye çapkirin.<sup>9</sup> Ahmed Aymutlu, di berhema xwe de diyar dîke ku ev berhema Kurdîzade Ahmed Ramîz wergera Mewlûda Vesîletûn- Necat a Sûleyman Çelebî ye.<sup>10</sup> Necla Pekolcay jî, di pirtûka xwe de cihê mewlûdeke bi Kurmancî ya ku di pirtûkxaneyaya Mîllî de ye, nivîsiye.<sup>11</sup>

Ji bilî van li Tirkiyeyê ti xebatên akademîk li ser Mewlûdên Kurmancî nehatine tespîtîkirin. Me nivîskaran jî xwest bi vê xebata me hem ji bo ku kêmasiya di vî warî de bê çareserkirin hem jî ji bo ku xebatên ku di pêşerojê de bînin kirin sûd jê were girtin.<sup>12</sup>

Di gotarê de ji Mewlûda Melayê Bateyî ku wekî yekem mewlûda Kurdî tê zanîn heta îro Mewlûdên Kurdiya Kurmancî yên ku ji alî nivîskaran ve hatine tespîtîkirin di du qîsman de hatine senifandin. Di vê senifandinê de hevşibîna di navbera rîwayetan de û mijarên wan hat esas girtin. Ji bo mewlûdên ku bandora Bateyî li ser wan e weke “Ekola Bateyî” hat binavkirin.

Gotar ji du beşan pêk tê. Di beşa yekemîn de pênas û dîroka mewlûdê û navê mewlûdên Kurdiya Kurmancî hatine nivîsandin. Di beşa duyemîn de, li ser Mewlûdên ku di bin têsîra Bateyî de ne lêkolîn hatine kirin. Di vê beşê de, ji bo mijar dîvdirêj û bela wela nebe Mewlûda Bateyî li gora mijarên wê hatiye kurtîkirin. Ji bo muqayesekirina mijar û rîwayetên Mewlûda Bateyî û mewlûdên li ber Mewlûda Bateyî hatine nivîsandin hêsan bibe, mijar û rîwayetên ku dişibîne hev, cihê wan di nîşebinan de hatin dayîn. Li vir an hejmara malikan an jî hejmara rûpelan di jêrenotan de hate dayîn.<sup>13</sup> Di beşa sêyemîn de mewlûdên ku di wan de mijar û rîwayetên ku ji hev cûda hatine bikaranîn hatin vekolandin.

<sup>9</sup> Okîç, gnb, r.30. M.Tayyib Okîç, di nivîsa xwe de cihê nusxeyeke vê mewlûdê jî daye: Pirtûkxaneyaya Milletê-Ali Emîrî- ya Stenbolê, di nava berhemên Tirkî yên matbu nimare 1369.

<sup>10</sup> Aymutlu, bnb, r.218.

<sup>11</sup> Pekolcay, bnb, r.28

<sup>12</sup> Ji bo navên mewlûdên bi zaravayê Zazakî bnr “Mewlidê Osman Efendi û Mewlido Zazakî”, *Nûpelda*, hejmar: 7-8, sal: 2011, Wan, r. 49-55. Li gorî gotarê navên mewlûdên Zazakî ev in: Mewlidê Nebî, Mela Ehmedê Xasî; Mewlido Dimilkî, Osman Esad Efendi; Mewlidê Pêxemberî, Mela Muhemmed Hunijî; Mewlidê Nebê, Meal Kamilê Puexî; Mewlido Zazakî, Mela Muhemmedê Muradan.

<sup>13</sup> Nivîskar li vir bi tenê li ser hevşibîna rîwayetan rawestiyar. Nivîskaran, sehîhî û nesehîhiya van rîwayetan ji ehlên wan re hiştin û ti nirxandin li ser wan nekir.

---

### 1. Mewlûd: Pênasiya wê, Dîroka wê

“Mewlid” (pirjimara wê: Mewalîd) di ferhengê de tê wateya cihê ji dayîkbûnê, dema ji dayîkbûnê.<sup>14</sup> Bêje weke “Mewlûd” jî tê bikaranîn. Lê belê ji ber ku bêjeya “Mewlûd” di ‘Erebî de tê wateya “yê/a jidayîkbûyî”, “nû jidayîkbûyî”, tê nîşandan ku bikaranîna bêjeyê ya bi vî awayî *-mewlûd-* çewt e.<sup>15</sup> Ji ber ku di axaftina Kurmancî de peyva *mewlûdê* tê bikaranîn di vê gotarê de jî şuna mewlidê de mewlûd hat bikaranîn.

Wateya “Mewlûd”ê ya têgînî, hem ji bo merasîmên ku di salvegerên ji dayîkbûna Hz. Pêxember de tên lidarxistin hem jî ji bo navê berhemên ku di van merasîman de tên xwendin tê bikaranîn.<sup>16</sup> Mewlûd, her wiha ji bilî cenabê Pêxember, ji bo bûyîn û salvegera jidayîkbûna kesekî jî tê gotin. Dîsa ji bo berhemên ku bûyîna kesekî û bûyerên ku dema ji dayîkbûna kesekî de qewimîne vedibêjin an jî hatine nivîsandin tê gotin.<sup>17</sup><sup>13</sup> Lê belê îro di nava gel de ji peyva mewlûdê tenê weke merasîmên ku ji bo Hz. Pêxember tên dayîn û berhemên di van merasîman de tên xwendin tê fehmkirin.

Derheqê mijara destpêka merasîmên mewlûdê de du nêrînen cûda hene. Li gora nêrîna yekemîn, merasîmên Mewlûdê cara ewil di heyama Fatimiyan de (910 – 1171), li Misirê hatine pêkanîn.<sup>18</sup> Lî gora nêrîna duyemîn kesê ku dest bi merasîmên mewlûdê kirine Muzaferûddîn Kökböri ye û ciyê destpêkirina mewlûdê jî Hewlêr/Erbîl e.<sup>19</sup>

Di vê mijarê de sedema çêbûna du nêrînen jihevçûda dibe ku ji ber pîrozkirinên girseyî û pîrozkirinên erkana dewletê be. Lewra di serdema Fatimiyan de merasîmên mewlûdê weke merasîmeke dewletê dihat lidarxistin û rêveberên payebilind beşdarî van merasîman dibûn. Di serdema Fatimiyan de beşdarbûna gel a bi girseyî di van merasîman de nehatiye dîtin. Merasîmên Mewlûdan ên ku bi beşdarbûna hemû gelê bajêr cara yekemîn di sala 1207an de li Hewlêrê di heyama atabegê Selçûkiyan Muzafferûddîn Kökböri de hatiye lidarxistin.<sup>20</sup> Ji vê heyamê pê de ye li ‘alema Îslamê, mewlûd bi merasîmên mezin tê pîrozkirin.<sup>21</sup>

---

<sup>14</sup> El-Müncid Fi'l-Luğa, Lewis Maoluf, Beyrut 1973, s. 918.

<sup>15</sup> Türk Dili Edebiyatı Ansiklopedisi (Devirler, İsimler, Eserler, Terimler), madeya *Mewlidê*, Weşanên Dergahê, İstanbul 1986, c.VI, r. 315. Ji bo wateyên mewlidê bi zimanê Tirkî û Erebi bnr heman berhem r. 315.

<sup>16</sup> Şeker, Mehmet, “*Mewlid*”, DİA-AİD/Ansiklopediya İslamê ya Diyanetê, Ankara 2004, c.XXIX, r.479–480.

<sup>17</sup> Çağmar, bnb, r.13-14.

<sup>18</sup> Ji bo nixandina vê nerîne bnr Selami Bakırcı, Bakırcı, *Mewlid Doğuşu Ve Gelişmesi*, Weşanên Akademik Araştırmalarê, İstanbul 2003, r. 9–14.

<sup>19</sup> Ji bo nixandina vê nerîne bnr Bakırcı, bnb, r.15–17.

<sup>20</sup> AİD, c.XXIX, r.475; Türk Dili Edebiyatı Ansiklopedisi, c.VI, r.315.

<sup>21</sup> Derheqê van şahiyên de ji bo agahiyên berfireh bnr AİD, c.XXIX, r.476–480.

Ev merasîmên ji bo Hz. Pêxember têne lidarxistin, digel ku di Qur'an û hedîsan de tune ye, ji heyamê ku derketî holê ve heya serdema me di nav Misilmanan de rastî eleqeyek mezin hatine. Mewlûd îro jî rastî eleqeyeke mezin tê, bi awayê civatên biçûk di malan de an jî bi girseyî di mizgeftan de tê lidarxistin.

Mewlûd berê di salvegera rojbûna Hz. Pêxember de dihate pêkanîn lê îro bi gelek sedeman tê xwendin û pêkanîn. Îro derdorên oldar, merasîma Mewlûdê bi sedemên cûrbicûr li dar dixin û hetta li ser tirbeyan mirov li rastî kesên bi diravan Mewlûdê dixwînin jî te. Jidayîkbûna zarokekê/zarokekî heta dawet û mirina wê/wî mirov li rastî merasîma mewlûdê tê. Heta di roja 7emîn, 40emîn a mirina kesekî/ê de û salvegera mirina kesekî/ê de jî Mewlûd tê xwendin. Ji bilî van Mewlûd weke nezir be jî tê dayîn û piştî hînbûna Qur'anê an jî cara yekem xitimkirina Qur'anê jî mirov li rastî xwendina wê tê.<sup>22</sup>

Pirbûna xwendin û lidarxistina merasîmên mewlûdê, bandoriyê li ser îdraka/fama "mewlûd"ê jî dike. Merasîma mewlûdê di nava gel de weke ferz tê zanîn, metna/ên mewlûdê jî weke metneke pîroz tê zanîn û bi vî awayî tê pejirandin. Xûyabûna mewlûdê di her dem û her devera jiyane de dibe sedema ku carinan mewlûd mîna "wehiy"ê were têgihîştin. Hetta hin kesên ku dibênin qey (ji wan tirê) mewlûdek tenê heye; dema ku dibihîzî gelek mewlûdên ku hatine nivîsandin hene diheyirin.

Belavbûna mewlûdê ya wisa zêde, ji bo kesên ku van merasîman dişopînin dibe sedema ku mewlûdê weke çavkaniyekê bibîne ku bi wê, agahiyên di derheqê Hz. Pêxember de hîn bibe. Berhemên ku di merasîmên mewlûdan de tên xwendin di nav gel de ji pirtûkên siyer û dîrokê yê ku heman mijaran vedibêjin bêhtir rastî eleqeyê tên. Ev aliyê mewlûdê bandoriyê li ser îdraka agahiya siyerê û di vê peywendê de li ser îdraka Pêxemberiyê jî dike û hin mewlûdên ku rîwayetên nerast dihewînin, xesarê didine îdrakkirina Pêxemberiyê. Di mewlûdên ku ji bo hestên gel ên olî geş bikin hatine nivîsandin de, biservekirina motîfên derasayî yê dîrokê, dibe sedema ji bilî kesayetiya Hz. Pêxember a dîrokî, modeleke din a Pêxemberiyê çêbibe. Ji ber vê divê gel ji bo xwendina mewlûdê di hîlbijartina mewlûdekê de baldar bibe.

<sup>22</sup> Ji bo sedemên xwendina mewlûdê bnr Armutlu, r.59–60.

---

**1.1. Mewlûdên bi zaravayê kurmancî hatine nivîsandin**

Kesî/ê ku dest bi vekolîna mewlûdên bi zaravayê kurmancî hatine nivîsandin bike, divê ji mewlûda Melayê Bateyî, *Mewlidi'n-Nebî*, dest pê bike. Ev mewlûd, ji heyama ku hatiye nivîsandin pê ve rastî eleqeyeke mezin hatiye. Ev mewlûd, li her derî tê xwendin û ewqasî navdar bûye digel ku gelek kes navê wê û nivîskarê wê nizanin jî ew malikên mewlûdê yê destpêkê, “Hemdê bêhed bo Xwedayê ‘alemîn / Ew Xwedayê daye me dînê mûbîn”, dizanin. Hetta serokê karên diyanetê Mehmet Görmez, di çalakiyên jidayîkbûna pîroz de, ku di sala 2011an de li Amedê hatibû lidarxistin ev malik xwendin.

Piştî Melayê Bateyî hetta îro digel ku mewlûdên ji hev cûda hatine nivîsandin jî yek ji wan mewlûdan mîna mewlûda Bateyî nayê zanîn. Ji ber ku yekem mewlûda Kurmancî ye, ji bo hemû mewlûdên ku piştî wê hatine nivîsandin bûye çavkanî. Di mewlûdên ku li ber mewlûda Melayê Bateyî hatine nivîsandin de, heman mijar ji aliyê nivîskarine din ve hatine bikaranîn. Ji van mewlûdan ên ku me tesbît kirine ev in:<sup>23</sup>

- 1- Mevlid-i Nebî, Muhammed Emîn Heyderî
- 2- Mevlûd-i Şerif, M. Zahîr Kardeşlik
- 3- Mewlûda Kurdî bi Zimanê Gundî, Mela Bedreddîn
- 4- Ava Heyatê, Mela Ali bin es-Seyyid Abdurrahman
- 5- Mewlûda Şerîf, Mela Muhammed Ali Fudeylî

Ev navdariya Bateyî ya di nava gel de miheqeq bandor li ser nivîskarên mewlûdan jî kiriye û lewma van nivîskaran mijarên ku Bateyî vegotine; rîwayetên ku wî bikaranîne; şewaza rêzkirina wî ya mijaran di mewlûdên xwe de jî sepandine. Gava ev mewlûd tîn vekolandin bandora Bateyî bi awayekî aşkere xuya dike. Ji bilî van mewlûdan hin mewlûdên din ên ku ji aliyê bikaranîna mijar û rîwayetan ve di bin bandora Bateyî de nemane jî hene. Ev mewlûd hemû di heyama me de hatine nivîsandin. Ji van mewlûdan ên ku me tesbît kirine ev in:<sup>24</sup>

- 1- Mewlûda Şerîf Ji Ewwel Heta Axir Rehber-i Xelasî Hz Muhammed (SAV), Mele Aliyê Êzdarî
- 2- Nezma Şerîn Der Mevlid û Sîreta Resûlê Emîn, Molla Muhammed el-Ğursî
- 3- Mewlida Pêxember, Mela Silêman Kurşun

---

<sup>23</sup> Navê pirtûkan û nivîskarên wan, li gorî navên li ser bergan hatine nivîsandin.

<sup>24</sup> Navê pirtûkan û nivîskarên wan, li gorî navên li ser bergan hatine nivîsandin.

4- Mewlûda Kurdi Bi Şewaza Hedbi, M. Burhan el-Hedbî

5- Durra Birinci Mewlûda Kurmanci, Molla Abdulhakim Halilî oğlu Muhammed Siracuddin.

## 2. Mewlûda Nebî û Mewlûdên li ber Wê Hatine Nivîsandin

Di qismên gotarê yên ji vir pê de mewlûdên ku li jor navên wan hatine nivîsandin, wê li gorî mijarên li ser rawestiyane û rîwayetên bikaranîne werin dabeşkirin.

### 2.1.1 Mevlîdî'n- Nebî

Ji aliyê Mela Huseyîn Bateyî ve hatiye nivîsandin. Di mewlûdên hatine çapkirin de digel ku navê Hasan el-Ertoşî hatiye bikaranîn, nivîskar bi navê Melayê Bateyî tê zanîn. Ji bo nivîskarî, navê Hasan el-Ertoşî di nav gel de nayê bikaranîn. Hetta di xebatên li ser wî û mewlûda wî de jî navê Mela Huseyîn Bateyî tê bikaranîn.<sup>25</sup>

Mewlûda Bateyî ji aliyê gelek weşanxaneyan ve hatiye çapkirin, li ser wê şîrove hatine kirin, hetta kurteya wê jî hatiye çêkirin.<sup>26</sup>Nusxeya vê mewlûdê ya herî kevn a hatî tesbîtkirin niha li Enqereyê (Ankara) li Pirtûkxaneya Gel a Bajêr a Adnan Ötükenê/ Pirtûkxaneya Neteweyiyê (Millî Kütüphanesi) ye.<sup>27</sup>

Metnê ku di vê gotarê de hatiye vekolandin, digel ku cih û dîroka çapkirina wê nehatiye diyarkirin ji alî Weşanxane û Çapgeha Ayfayê (Ayfa Basın Yayın) ve hatiye çapkirin. Ev çapa ku ji 48 rûpelan pêk tê bi ser her sê rûpelên wê ên dawî ve di'aya 'Erebî hatiye lêzêdekirin. Mewlûda Bateyî, tevî malikên selewatan ji 582 malikan pêk tê. Di çapa hatî vekolandin de mijar/beş nehatine binavkirin.

Derbasbûna di nav mijaran de bi van malikên li jêr pêk tê:

“Ger divêtin hûn ji narê bin necat

<sup>25</sup> Wek mînak bnr *MEB İslam Ansiklopedisi*, Çapxaneya Millî Eğitimê, İstanbul 1967, c.VI, r.113; M. Xalid Sadîni, *Mela Huseynê Bateyî Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2010.

<sup>26</sup> *Mewlûda Kurmanci Muhtasar Mevlid-i Nebi Alehisselatuveselam*, Muhammed Mehdi el-Amidi, cî û dîroka çapê tune ne. Lê di dawiya pirtûkê de hatiye nivîsandin ku pirtûk di 31ê Tebaxa 2002an de xelas bûye-qediyaye. Di vê berhemê de hin rîwayetên ku Bateyî neqil dike hatine derxistin; Behcetü'l En'am Bişerhi Mevlidî'n-Nebi Aleyhisselatuveselam, ev berhem şerheke li ser mewlûda Bateyî ye. Hem di berga pirtûkê de hem jî di rûpelên ewil de navê nivîskêr tune ye. Lê di dawiya pirtûkê de, dawiya beşên ferheng û fihristê de navê Zeynelabidin el-Amidi hatiye nivîsandin. Di mewlûda Bateyî de navên beşan tune ne. Lê di vê şerhê de şarih nav li beşan (18 beş) kirine. Cih û dîroka çapê tune ne. Ji bil van berheman, latînzekirina mewlûda Bateyî jî heye: Bnr *Mewlûd*, Latînzekar: Zeynelabidin Zinar, Weşanên Fîratê, İstanbul 1992.

<sup>27</sup> Sadîni, piştî rûpela 248an wêneyên vê mewlûdê dane.

---

Bi ‘îşq û şewqek hûn bibêjin esselat’<sup>28</sup>

Malika mewlûdê ya yekê bi vî awayî ye:

“Hemdê bêhed bo Xwedayê ‘alemîn  
Ew Xwedayê daye me dînê mobîn”

Malika mewlûdê ya dawî jî bi vî awayî ye:

“Amînê çav bûne rewşen we’s-Selam  
Hem ji mewlûda nebî temme’l-Kelam”

Piştî vê malikê re derbasî di’aya mewlûdê ya bi Kurmancî hatiye nivîsandin bûye.

### **2.1.2. Mewlûdî’n–Nebî**

Ev mewlûd, a Şeyh Muhammed Emîn Haydarî ye. Ev mewlûd, bi mewlûda Melayê Bateyî re hema bêje heman (‘eynî) e. Di vê mewlûdê de jî beş nehatine binavkirin. Metnê di vê gotarê de hatiye vekolandin, digel ku cih û dîroka çapkirina wê nehatiye diyarkirin ji aliyê weşanxane û çapgeha Ayfayê ve hatiye çapkirin. Ev mewlûda ku ji 32 rûpelan pêk tê, Di’aya ‘Erebî bi ser her sê rûpelên wê yên dawî ve hatiye lêzêdekirin. Ev mewlûd, tevî malikên selewatan ji 320 malikan pêk tê. Derbasbûna di nav mijaran de bi malikên ku xwendina selewatan divê yên jêrîn pêk tê:

“Hûn ji ‘îşqa dil bibêjin berdewam  
Ser Muhemmed esselatu we’s-selam”

Malika mewlûdê ya pêşî wiha ye:

“Em bidin hemdê Xwedê Ey Musluman  
Daye me Pêxemberê axirzeman”

Jidayîkbûna Hz. Pêxember dawiya vê mewlûdê ye. Malika pêşî ya vê beşa dawî ku “Merheba” ye wiha ye:

---

<sup>28</sup> Malikên jêgirî yên mewlûdan li gorî çapa wan e. Me bo rastnivîsîna giştî ya gotarê dest lê nedaye.



---

“Hat Muhammed Merheba Sed Merheba

Hat Muhammed bu şefî’ê muznîba”

Digel ku ev beş, beşa “*Merheba*”yê ye, peyva *Merhebayê* di malika pêşî ya vê beşê de ku me li jorê dayî derbas dibe. Di malikên din de peyva “*Hat*”ê li şûna *Merhebayê* hatiye bikaranîn ango malik bi peyva *Hatê* dest pê dikin û mewlûd xelas dibe.

Malika mewlûdê ya dawî wiha ye:

“Hat Muhammed Rehmeten lî’l-‘Alemîn

Hat Muhammed Xatîmen lî’l-Murselîn”

Piştî malika dawî bi di’aya mewlûdê ya ku bi Kurdî hatiye nivîsandin û ji sê rûpelan pêk tê mewlûd diqede.

### **2.1.3. Mewlûd-î Şerîf**

Nivîskarê vê mewlûdê M. Zahid Kardeşlik e. Di çapa vê mewlûdê ya ku me lêkolîn li ser kirî de dîrok û cihê çapkirinê nehatiye diyarkirin. Lê di rûpelê mewlûdê yê herî dawî de wekî dîrok 1989 heye. Ji vê tê fêhmkirin, ev dîroka qedandina vê mewlûdê ye. Ev nusxeya me lêkolînê li ser kiriye, ji 58 rûpelan pêk tê.

Mewlûd tevî malikên selewatan, ji 687 malikan pêk tê. Mewlûd ji 22 beşan pêk tê. Di mewlûda Melayê Bateyî de navên beşan tune ne lê di vê mewlûdê de beş hatine binavkirin. Sernavên beşan bi Kurdî ne. Derbasbûna di nav mijaran re, bi malikên selewatan ên jêr pêk tê:

“Ger dixwazin hûn xilasbin ji agir  
Selewatan bînin civata hazir”

Malika mewlûdê ya pêşî wiha ye:

“Pesnê pir bo Xwedayê ‘alemê  
Ew Xwedayê daye me pir keremê”

Malika dawî jî wiha ye:

“Paşiya mewlûdê li vir bûye tamam  
Ji haziran re em bibêjin Es-Selam”

Piştî malika dawî re malikên selewatan tên, paşê jî beşa di'aya mewlûdê ya bi Kurdî hatiye nivîsîn tê.

#### **2.1.4. Mewlûda Kurdî bi Zimanê Gundî**

Es-Seyyid Bedreddin İbni Molla Salih el-Hüseyni eş-Şafii el-Kufsurî ev mewlûd nivîsandiye. Çapa ku lêkolîna me li ser hatî kirin ji aliyê Weşanên Nûbiharê ve hatiye weşandin. Mewlûd ji 40 rûpelan pêk tê. Cudahiyeye vê mewlûdê heye. Nivîskar, di rûpelên dawî yê mewlûdê de, li hemberî kesên derheqê mewlûdê de fikirên neyînî tînin ziman, 21 delîlên ku li ser mijara rewatiya mewlûdê ya di dîne Îslamê de ne tîne.<sup>29</sup>Ji bilî vê jî, di herdu rûpelên ji berî mewlûdê de qesîdeyek li ser pîrbûnê nivîsandî hatiye biservekirin.

Mewlûd, tevî malikên selewatan ji 220 malikan pêk tê. Derbasbûna di nav beşan de bi malikên selewatan ên jêr pêk tê:

“Salat û selama bidin her zeman li pêxemberê me ku fexrê cîhan  
Salat û selama bidin her seet li pêxemberê me şefî'ê ummet”

Malika mewlûdê ya pêşî wiha ye:

“Hemd û wesfê bê hîsab û bê eded  
Bo wî Yezdan ê Dilovan û Semed”

Ji ber ku mewlûd bi beşa *Merhebayê* diqede malika wê ya dawî wiha ye:

“Tu bixêr hatiye Ey Nûra Yetîm  
Şu'le da erd û semâ 'Erşê 'Ezîm

Nehdî îleyke's-Selat û we's-Selam  
Kulle weqtî we zemanî ber dewam”

Piştî beşa ku tê de wesfên Hz. Pêxember tên dayîn, mucîzeyên wî tînin vegotin, selat û selam tînin xwendin, di'aya mewlûdê hatiye biservekirin.

#### **2.1.5. Ava Heyat**

Ji aliyê Mele Alî bîn es-Seyyîd Abdurrahman ve hatiye nivîsîn. Abdusellam Bêcirmaniye kû mewlûd ji bo weşanê amade kiriye dema navê nivîskar dide, wî wiha dide nasîn: “El-Ustad Molla Ali b. Es-Seyyid Abdurrahman el-Ma'ruf b. Sofî Haco el-Mardini

<sup>29</sup> Bnr *Mewlûda Kurdî*, Weşanên Nûbiharê, İstanbul, r.27–40.

sümme er-Rehawî el-Medfun fi Qaryetî Xirbê Temo et-Tabieti li beldeti Re'sil Ayn 'ala wasiyyetîhî”.

Çapa mewlûda ku hatî lêkolîn li Mersinê hatiye çapkirin lê dîroka çapê li ser nehatiye nivîsîn. Mewlûd, ji 48 rûpelan pêk tê. Mewlûd, tevî malikên selewatan ji 247 malikan pêk tê. 17 beş di mewlûdê de hene lê beş nehatine binavkirin. Derbasbûna di nav beşan re, bi vê malikê pêk tê:

“Ji agir we bivêêt dûrî bin  
Selat û selama li Muhammed bidin.”

Malika mewlûdê a pêşî wiha ye:

“Bê hed hemd ji bo te Xwedayê Kerîm  
Bime date zanîn rêya Musteqîm”

Malika dawî jî wiha ye:

“Bi Selat û selama bikin em xîtam  
Bi hev re bikin tev ji bo wî qiyam”

Dûv re derbasî di'aya mewlûdê dibe. Piştî di'aya mewlûdê, di beşa bi navê “Heydarî” de mebesta nivîsîna mewlûdê hatiye vegotin, li dawiyê jî helbesteke bi navê “Rêya Dûr” hatiye biservekirin.

### **2.1.6. Mewlûda Şerîf**

Ji alî Mela Muhammed Ali Fudeylî ve hatiye nivîsîn. Ji bo vê gotarê, ji nusxeya mewlûdê ya destnivîsê ku Komeleya Lekolînên Şarkiyatê neqlî elektronîkê kiriye, sûd hatiye wergirtin.

Di dawiya mewlûdê de hatiye diyarkirin ku nusxe ji aliyê Zeynelabîdîn el-Amîdî ve di sala 1996an de hatiye nivîsandin. Ji ber ku rûpelên mewlûdê yê 11 û 12an kêma in digel ku hejmareke tam nikare bê dayîn ji 16 – 18 beşan û tevî malikên selewatan tê texmînkirin ku ji 510 – 514 malikan pêk tê.

Di mewlûdê de beş nehatine binavkirin, derbasbûna di navbera mijaran re, bi vê malikê pêk tê:

---

“Ger dixwazin hûn ji agir bin xelas  
Hûn selatan tevde bînin ‘am û xas”

Malika mewlûdê ya pêşî wiha ye:

“Hemd û şukr û pesnê pir ji Xweda re  
Ewî Îslam hediye kirbû ji me re.”

Malika dawî jî wiha ye:

“Kêfa Abdulmuttalib pir hatibû  
Kêfa me jî gelek pêre hatibû”

Mewlûdên ku li jor bi kurtasî hatine danasîn hemû, ji bilî *Mewlûda Kurdî Bi Zimanê Gundî*, ji hêla mijar û rîwayetên hatine bikaranîn ve bi temamî li ber mewlûda Melayê Bateyî hatine nivîsîn.<sup>30</sup> Ji ber vê yekê dema ku em mewlûda Bateyî vekolin, cihên mijar an jî rîwayetên di mewlûdên din de derbas dibin em dê diyar bikin. Ji bo ku di çapên cihê de dîtina mijaran hêsan be li gorî çapa mewlûdan an rêza malikan, an hejmara rûpela ku rîwayet tê de derbas dibin, an jî hem rêza malikê hem jî hejmara rûpelê hatine dayîn.

## **2.2 Rîwayetên Ku di Mewlûda Nebî de Hatine Veguhastin û di Mewlûdên Din Ên li ber Wê Nivîsandî de Cihên Wan Rîwayetan.**

Beşa bi navê El-babul Ewwel Fî Mebhasî'l-Hamd<sup>31</sup> a ku malikên di navbera 1 - 11an vedigire û beşa bi navê El-Babu's-Sani Fî Mebhasî's-Selati 'ale'n-Nebiyî Sallallahu 'Aleyhi ve Selem a ku malikên ji 2yan heta 24an vedigire ji ber ku beşa hemd û selewatan e em ê biqevêzin. Ev her du beş mîna Mewlid-i Nebî, di mewlûdên din de jî bi wî awayî derbas dibin.

### **El-Babu's-Salîsu Fî Fadîletî Qîraatî Mewlîdî'n-Nebiyî Sallallahu 'Aleyhi we Sellem**

---

<sup>30</sup> Ji bil van mewlûdan, dema min (Hayreddin KIZIL) li Diyarbekirê di serdema 2006-2007an a perwerdehiyê de, li dibistaneke taybet mamostetî dikir mewlûdek li ba xwendekarekî dît. Xwendekêr, derheqê mewlûdê hin agahdarî dan: Bi awê gotina wî ev mewlûd ji alî merivekî wî ve hatiye nivîsîn. Merivê xwendekarî li ser defterekê mewlûd nivîsibû. Min fotokopiyeke mewlûdê girt. Navê mewlûdê *Pesindana Muhammed* e. Navê nivîskêr jî Muhammed Halim Hîfzî Huhan e. Heya vê salê jî çapa wê tune ye. Mewlûd bi du nusxeyan hem bi herfên Erebi hem bi herfên Latîni hatiye nivîsandin. Nivîskêr, di dawiya mewlûdê de diroka nivîsandina berhemê daye: 28ê Ramazana 2001. Mewlûd ji 465 beytan pêk tê. Pir hindik be jî hin cudahî di navbera her du nusxeyan –bi herfên Erebi û bi herfên Latîni- de heye. Zimanê mewlûdê sivik e lê li ser rêbaza mewlûda Bateyî ye. Ji ber ku çapa mewlûdê tune ye me di bara mewlûdê de agahiyê berfireh neda û vê mewlûdê û ya Bateyî neda berhev.

<sup>31</sup> Ji bo mijar baştir bê fêmkirin her çiqas di metna orijinal de tune be jî me ji şerha mewlûdê, Behcetü'l-Enamê, navên mijaran wergirtin.

Di vê beşê de fezîleta xwendina mewlûdê tê vegotin. Ev beş, di mewlûda Bateyî de malikên ji 25an heta 45an vedigire.

Mewlûd û pêkanîna mewlûdê digel ku piştî heyama pêxember û sehabiyên bi sedsalan derketiye holê, di navbera malikên 26 – 31ê de Bateyî, rîwayetên ku, tê gotin Hz. Pêxember, Hz. Omer û Hz. Ebu Bekir li ser girîngiya mewlûdê vegotine, neqil dike.

Li gorî mewlûdê Hz. Pêxember wiha gotiye: “Ez ê di mehşerê de bibime şefaatterê hemû kesên ku qîmet dane mewlûda min. Kesê qîmet bide mewlûdê wê ji kewserê vexwe. Dîrhemêke ji bo mewlûdê hatî serfêkirin, mîna çiyayek zêr e ku li feqîran hatî belavkirin. Pir qîmet bidin mewlûda min”.

Bi heman awayî hatiye diyarkirin ku Hz. ‘Umer û Hz. Ebu Bekir jî gotine ku dîrhemêke ji bo mewlûdê were serfêkirin wê pir xêr jê were girtin. Di mewlûdên weke Mewlûdî’n-Nebî ya Haydarî,<sup>32</sup> Mewlûd-î Şerîf a M. Zahîr Kardeşlik,<sup>33</sup> Ava Heyat,<sup>34</sup> Mewlûd-î Şerîf a Fudeylî<sup>35</sup> de mirov li rastî van rîwayetên ku xwe dispêrin Hz. Pêxember, Hz. ‘Umer û Hz. Ebu Bekir tê. Lê belê, di Mewlûda Haydarî, Fudeylî û Ava Heyat de di cihê heman mijarê de rîwayetên hene tê îddîakirin ku ji Hz. Osman û Hz. Alî hatine.

Li vir divê mirov hay ji vê tiştê hebe: Di Mewlûda Melayê Bateyî û di mewlûdên din ên ku di bandora wî de hatine nivîsandin de, rîwayetên ku ji Hz. Pêxember û sehabiyên in vegotina derheqê girîngiya mewlûdê de naye guhertin, bi tenê peyv cihê dibin, peyv kêman zêde tene nivîsandin.

Wek mînak, dema Kardeşlik heman mijarê dinivîse, rîwayetên wiha nivîsandî ne: Hz. Pêxember dê bibe şefa’etkerê kesê qîmet dide mewlûdê û salê carekê wê dide xwendin, ew kes dê ji kewserê vexwe û dê bibe hevalê pêxemberan.<sup>36</sup>

Dîsa di heman beşa mewlûda Bateyî de hatiye îddîakirin ku ‘alimên Îslamê gotine, xwarina ku mewlûd li ser were xwendin wê bimbarek be, devera ku mewlûd lê tê xwendin wê ji belayan were parastin, kesên li devera ku mewlûd lê tê xwendin amade ne wê bi pêxemberan re werin heşrkirin.

<sup>32</sup> Haydarî, malikên di navbera 15-22an de.

<sup>33</sup> Kardeşlik, r. 5-7.

<sup>34</sup> Ava Heyat, r. 11-12, malikên di navbera 40-53yan de.

<sup>35</sup> Fudeylî, malikên di navbera 35-46an de.

<sup>36</sup> Kardeşlik, r. 5. “Dê heval bit ew di nav pêxemberan.”

Di mewlûda Haydarî,<sup>37</sup> Ava heyat,<sup>38</sup> Mewlûd-î Şerîf a Kardeşlîk<sup>39</sup>, û di mewlûda Fudeylî<sup>40</sup> de mirov bi awayekî dirûvê hev li rastî van rîwayetan tê. Di van mewlûdan de jî derheqê bereketa xwarinên mewlûdê û civîngeha mewlûdê de, rîwayet ji ‘alimên Îslamê tene neqilkin.

### **El-Babu’r-Rabî’ Fî Beyanî Xalqî’n-Nurî Nebiyyî Muhammed Sallallahu ‘aleyhi we Sellem we Xelqî Eşyayî**

Ev beşa ku Nûra Muhammed û afirandina eşya vedibêje, di mewlûda Bateyî de navbera malikên 46 – 78an vedigere.

Xwedê, hê ‘Erş, Ferş, Kursî, Qelem, Lewh û enbiya tunebûn, ji nûra xwe rahijte çengekê, gote wê “Bibe Hebîbê Min Ehmed!” dûv re wê nûrê 624000 salan tesbîh kir. Dûv re ji bo wê nûrê 12 Hîcabê ku ji Qudret, Ta’zîm, Mînnet, Merhamet, Seadet, Keramet, Menzîlet, Hîdayet, Nubuwwet, Rif’at, Ta’et, Şefa’et pêk tên, hatine çêkirin. Ji wan hîcaban her yek – dema wan a herî rast bi tenê Xwedê dizane – di wê nûrê de çend salekê rawestiya. Wan hîcaban her yekê bi tesbîheke taybet û cihê Xwedê tesbîh dikirin. Dûv re Xwedê, ew nûr avetine çar behrên mezin ên ku navên wan Nusret, Kudret, Merhamet, Îrfan in. Dema ew nûr ji behra me’rifetê<sup>41</sup> derket dilopan jê dest bi niqutînê kir. 124000 dilop. Ji wan dilopan her yek bû pêxemberek. Dûv re “Xwedê ji wê nûrê cewherê afirand û li wê nihêrî. Cewher bû du perçe. Li perçeyê yekemîn bi nêrîna mezinahiyê (heybet), li perçeyê duyemîn bi nêrîna dilovaniyê nihêrî. Cewhera yekemîn, bû behreke ku ji mezinahî (heybet) û tîrsa Xwedê ranawestê û her tim diherike, tevdiqere. Behr keliya, kef û dûxan (dû) jê derketin, kef bû rûyê ‘erdê, dûxan (dû) bû asîman. Nîvê din jî (Perçeyê cewherê duyemîn) kire ‘erş, Kursî, Qelem û Lewh.

Heman rîwayet di mewlûda M. Zahîr Kardeşlîk de jî heye.<sup>42</sup> Lê belê di vê mewlûdê de tê vegotin ku nûr ketiye şeklê çivîkê û li ser rikehekê rawestiyaye û 124000 salan tesbîh aniye.<sup>43</sup>

<sup>37</sup> Haydarî, malikên di navbera 24-43yan de.

<sup>38</sup> Ava Heyat, r.13-14, malikên di navbera 55-67an de.

<sup>39</sup> Kardeşlîk, r. 7.

<sup>40</sup> Fudeylî, r. 5.

<sup>41</sup> Li vir aloziyek xuya ye lewra li malikên berê “perdeya me’rifet”ê û “behra merhemet”ê tê gotin. Lê li vir “behra me’rifet”ê derbas dibe.

<sup>42</sup> Kardeşlîk, r. 8-10.

<sup>43</sup> Bnr Kardeşlîk, r. 8.

Bateyî di heman beşa mewlûdê de evana jî diyar kirine:

Xwedê, ji van cewheran ferman da Qelemê: “Ey Qelem, Binivîse!

Qelemê got, “Ferman bike, ez çi binivîsim?”

Xwedê, “Binivîs! “La îlahe îlla Ene

Hem Muhammed Qasidê emrê min e”

Qelemê çû secdê di rewşeke bêhiş de sed salî geriya. Serê xwe rakir û pirsî: Ez dizanim La ilah illa Tu yî, lê ew Muhammed kî ye li hemberê navê Te tê!”

Padîşahê sermedi (ebedî) got: “Heke Muhemmed nebûya min ‘Erş, Ferş û Lewh nediafirandin. Ne bihuşt, ne dogeh, ne agirê mezin, min ev hemû ji bo wî afirandin.” Wê gavê hezkirina Pêxember Qelem hingaft û bû du perçe. Ma li ser Lewhê nivîsî dem bi dem. Serxweş bû, ji hiş ket. Dûv re bi sirûşa (îlhama) Rebbil ‘alemîn nivîsî: “Ya Muhemmed! Silav ji Te re.”

Cenabê Heq (Rebbê Layenam), li şûna Hz. Pêxember (Hebîb-î ‘izzet) silav da: “Aleyke’s-salam we rehmetî.” Ji wê rojê ve dayîna silavê bûye sinnet, girtina wê (lê vegeandina wê) bûye ferz.

Dûv re Xwedê hemû eşya ragihande qelemê. Qelemê nivîsand. Nivîsand ku ummetên qenc wê biçine bihuştê, ummetên xerab wê biçine dogehê. Ummeta Muhemmed, weke “Ehlê Nûr” nivîsand. Piştî ku qelemê çi qenc û çi xirab her tişt nivîsandin ziwa bû.

Heman mijar bi awayekî hevşêwe (wekhev) di mewlûda Haydarî de<sup>44</sup>, di Mewlûdî Şerîf a M. Zahîrî Kardeşlik de<sup>45</sup>, di mewlûda Fudeylî de derbas dibe.<sup>46</sup>

### **El-Babul-Xamîsî Fî Beyanî Xelqî Adem ‘aleyhî s-Salam**

Ji navê beşê jî tê fêmkirin ku di vê beşê de mijara afirandina Hz. Adem heye. Ev beş di mewlûda Bateyî de navbera malikên 79 – 117an vedigire:

Dema Xwedê viya Adem biafirîne ji Cebraîl xwest ku ji beyda zemînê (ji devera ku gora Hz. Pêxember lê ye) ya ku dil (qelb), qîmet, xweşikî û xemla rûyê ‘erdê ye, çengek ax bîne. Cebraîl bi axa ku ji gora hêja girtî hat. Bi ava çemê Tesnîm<sup>47</sup> ê bihuştê stiriha. Ax bû

<sup>44</sup> Haydarî, malikên di navbera 46-79an de.

<sup>45</sup> Kardeşlik, r. 11-12.

<sup>46</sup> Fudeylî, r. 6-8.

<sup>47</sup> Di Sûretê Muteffifînê di ayeta 27an de derbas dibe.

hevîr. Cebrâil têr baş stiriha. Welê bû ku ew hevîr bû mircaneke spî. Dûv re Xwedê ji Cebrâil re got ku rahêje wê, li ‘erd û asîmanan, behr û bejayê, rojhilat û rojavayê bigerîne. Bi hezaran sal derbas bûn. Afîrînerê sûretan Xwedê, ji wê Adem afirand. Ji giyanê (rih) xwe pif kiriyê. Ferîştehan ji Adem re çûn secdê.

Piştî Adem hate afirandin Xwedê, Nûra Muhemmed xiste piştî wî. Dûv re Adem di bihuştê de bi cih kir. Ji Adem re got ku ji bilî darê ji her ni’metê bihuştê bixwe. Ferîştehan, li pişt Adem rêz bûn. Li Nûra Muhemmed dinihêrîn. Adem pirsî ka çima her tim li piştî wî dinêrin. Xwedê, ji Adem re got ku Nûra Muhemmed di piştî wî de ye, ferîşteh ji bo ku wê Nûrê bibînîn ji dûr hatine. Hz. Adem ji Xwedê lava kir:

Gote Adem: “Ey Xwedawendê Felek! Min divêtin bîne pêş min ew melek”.

Di wê gavê de Nûr hate ser rûyê wî, hin kes dibêjin hate ser tiliya wî ya şehdeyê. Rastiya wê Xwedê dizane. Mîna ku tava navrojê, ku li asiman dibiriqê biriqî. Adem û Ferîştehan mane ‘ecêbmayî.

Gote Adem, ji vê pê ve Nûr li wir mane? Bersiva “Eshabê Resûl” hate dayîn. Hate îfadekirin ku Nûrê Eshabê Resûl mane. Adem got, “Ya Îlahî qenc e bît. Bête tiliyan her çi maye min divêt.” Nûra Ebû Bekir, ‘Umer, Osman û Hz. ‘Elî ketine tiliyên Hz. Adem. Tê gotin dema nûra Hz. ‘Elî hat bihuşt ronahî bû.

Hewwa hat û li Nûrê nihêrî. Got ev çi nûreke zelal e. Adem got, Nûra nebiyekî mezin e ku ew ê bibe seyîd û serwerê dundana/nesla min.

Ku Adem bêemriya Xwedê kir, Adem û Hewwa ji dara qedexe xwarin, ji bihuştê hatine derxistin. Xwedê, Adem danî Serendîbê. Ji ber bêemriya kirî poşman bû. Bi salan hêstirên çavan barandin. Ji hestirên ku wî barandin ax bû herî. Giya û dar hêşîn bûn.

Heman mijar û rîwayet di mewlûda Haydarî<sup>48</sup>, Mewlûda Kurdî<sup>49</sup>, Ava Heyatê<sup>50</sup>, Mewlûda M. Zahîr Kardeşlik<sup>51</sup>, Mewlûda Fudeylî<sup>52</sup> de, bi awayekî dirûvê hev derbas dibin. Lê belê ji ber ku du rûpelên mewlûda Fudeylî kêr in me nekarî tesbît bikin ka çawa qedandiye. Lê di malika 127an de hatiye diyarkirin ku Îblîs ew her du xapandine û wan ji dara genim

<sup>48</sup> Haydarî, di navbera malikên 80-118an de.

<sup>49</sup> Mewlûda Kurdî, di navbera malikên 34-59an de.

<sup>50</sup> Ava Heyat, r. 7-8, di navbera malikên 12-22an de.

<sup>51</sup> Kardeşlik, r. 13-16.

<sup>52</sup> Fudeylî, r. 8-10.



xwariye. M. Zahîr Kardeşlik di mijara cih de, ji yên din cihê dibêje li gorî ku Kardeşlik nivîsandiye, yek ji herduyan li Hîndîstanê yek jî li Çînê hatiye danîn.<sup>53</sup>

Di mewlûda Kardeşlik nivîsandî de, bi awayekî ji yên din cihê tê diyarkirin ku Melekê Tawûs ji ber bêemriya Xwedê bûye Şeytan, xwe qure kiriye û di dawiyê de heta hetayê ji rehma Xwedê dûr maye.

“Melekê Tawus diwê xwe Şeytan kirî  
Xwu qure kir secde ji bo wî ne birî  
Fam nekir secde ji bona Xaliq e  
Ebedî ji rehma Xwudê bu farîq e”<sup>54</sup>

Fudeylî jî di navbera malikên 106 – 109an de gotinên mîna van vedibêje lê li şûna navê Melekê Tawus, navê Azazîl bi kar tîne û diyar dike ku piştî wê bûyerê, “toqa”<sup>55</sup> li serê wî hate kirin.

“Rebbê ‘alem emir da bo melean  
Secde birin ji Adem re tevekan  
Emrê Xweda hemiya jê re secde bir  
Wî Azazîlê tenê xwe qure kir  
Jê xeyîdî qewirand ji ber derî  
Wî toqê bi emrê Xweda kete serî  
Bîr nebî secde ji bona Xweda bû  
Bê umîd ma, xu li xu kiri bû”

Di Mewlûda Kurdî Bi Zimanê Gundî de wiha tê vegotin:

Xwedê, ji wan re got di bihuştê de biqasî hûn dixwazin bixwin lê ji dara genimî qet nexwin. Kê ji Xwedê bêxeber ji dara genimî xwariba ew ê ji bihuştê hatiba derxistin. Lê belê Îblîs, li ber deriyê Cinan xefk vedabû. Mar û Tawûs ji bihuştê derketin. Îblîs li pêşiya wan bi awayekî xemgîn rûnişt. Qêrîn fikir, got, Hawar! Hawar! Hawar! Kî ji dara gênim nexwe wê ji bihuştê derkeve. Mar û Tawûs ji tirsra giriyan. Bi Azazîl re reviyane bihuştê. Şeytan çû kêleka Adem. Ez nesîhetker im. Ji bo te dostekî qenc im. Heke tu ji dara gênim nexwe hawar ji bo te. Tu dê ji bihuştê derkevî û bêstar herî ser rûyê ‘erdê. Adem û Hewwa ji gotinên wî bawer kirin. Di wê gavê de ji darê xwarin. Ji ber ku bêemriya Xwedê kirin ji bihuştê hatine derxistin.<sup>56</sup>

<sup>53</sup> Bnr Kardeşlik, r. 16.

<sup>54</sup> Kardeşlik, r. 14.

<sup>55</sup> Alameta la’net li hatina wî ye.

<sup>56</sup> Mewlûda Kurdî, malikên di navbera 45-59an de.

---

**El-Babu's Sadîsu Fî Beyanî Nesebî'n- Nebiyyî Muhammed Sallallahu 'aleyhî we Sellem**

Ev beşa ku dunda Hz. Pêxember vedibêje, di mewlûda Bateyî de navbera malikên 118 – 128an vedigire. Di vê beşê de kesên ji Hz. Adem heta Hz. Pêxember, yanê bapîrên Hz. Pêxember tên hijmartin. Di mewlûdê de hatiye diyarkirin ku di derheqê dunda navbera Hz. Adem û Hz. Ednan de ciyawazî (cihêti) heye lê belê hatiye diyarkirin ku di navbera Hz. Adem û Hz. Ednan de 21 dund hene û navên wan hatine diyarkirin.

Heman mijar bi awayekî hevşib di mewlûda Haydarî<sup>57</sup> de, mewlûda M. Zahîr Kardeşlik<sup>58</sup> de, di Mewlûda Kurdî<sup>59</sup> de, derbas dibe. Di Ava Heyatê de ji van cihê li şûna Hz. Adem navên bapîrên Pêxember ên di navbera Hz. Îbrahîm û Hz. Pêxember de hatine dayîn.<sup>60</sup>

**El-Babu's Sabî'u Fî Beyanî wîladetî Ebdîllahî Ve Întîqalî'n-Nurî Îleyhî.**

Ev beşa ku jidayîkbûna bavê Hz. Pêxember, Hz. Ebdullah û di Ebdullah de xuyabûna Nûra Muhammed vedibêje, di mewlûda Bateyî de navbera malikên 129 – 163an vedigire.

Di navbera malikên 131 – 147an de hatiye diyarkirin ku dema Ebdullah ji dayîk bû, li Şamê xwîna Hz. Yehya ya li ser cubbê wî ya ji dema hatî şehîdkirin mayî, nû bû, rehn bû. Keşeyan (Rahîban) gotine “Heywax xeber nêzîk e, çaxê rakerê (nesîh) Tewratê, Încîlê nêzîk e. Nûbûna xwîna Hz. Yehya vê dide xûyakirin.” Keşeyan, fêhm kiribû ku Ebdullah ji dayîk bûye û jidayîkbûna Hz. Muhammed jî nêzîk e. Bi armanca kuştina Ebdullah gelek caran hatin Mekkeyê. Lê belê hifza Xwedê, Ebdullah parast. Nûra Ahmed, Ebdullah ji xerabiyên wan dûr kir.

Heman mijar û rîwayet di mewlûda Kardeşlik<sup>61</sup> û di Mewlûda Kurdî<sup>62</sup> de jî derbas dibe. Lê bi awayekî vajiyî rêzkerîn e di mewlûda Kurdî de ‘ewil şekl û şemalê Hz Pêxember hatiye vegotin,<sup>63</sup> dûv re mijara bavê Hz. Pêxember, Ebdullah, di mewlûdê de cih girtiye.<sup>64</sup>

---

<sup>57</sup> Haydarî, malikên di navbera 120-129an de.

<sup>58</sup> Kardeşlik, r. 17-18.

<sup>59</sup> Mewlûda Kurdî, malikên di navbera 60-72yan de.

<sup>60</sup> Ava Heyat, r. 14-15.

<sup>61</sup> Kardeşlik, r. 19-21.

<sup>62</sup> Mewlûda Kurdî, malikên di navbera 87-98an de.

<sup>63</sup> Bnr Mewlûda Kurdî, malikên di navbera 73-86an de.

<sup>64</sup> Bnr Mewlûda Kurdî, malikên di navbera 87-114an de.

Di mawlûda Bateyî de, di navbera malikên 149 – 163yan de hatiye vegotin ku Ebdullah ji bavê xwe re çûna xwe ya Bethaya Beşîr (Geliyê Beşîr) gotiye. Dema ez diçim Bethaya Beşîrê, li wir, ji piştta min nûreke mezin derdikeve, bilind dibe, dibe du qet, yek diçe şerqê (rojhilat) yek diçe xerbê (rojawa) û dibînim dû re her du jî vedigerin. Di wê gavê de, asîman dibe du qet, nûr derdikeve tebeqeya heftemîn a semayê, dîsa (bi lez) tê dikeve piştta min. Ebdullah wiha dewam dike:

“Dema ez li derekê rûdinim, tiştên xerîb çêdibin. Ji ‘erdê ev dengên ha tên: “Ji te re û ji nûra Muhammed re silav.” Ez bikevim bin kîjan dara hişkbûyî, hêşîn dibe, ji min re dibe sî. Dema ez ji wir diçim dîsa weke berê lê tê. Yabo (Bavo), ev çi ye û îşareta çi ye. Ji min re bibêje!

Bavê wî wiha bersiv da:

“Rohniya çavê di min! Şa be, mizgîn li te Ey nazenîn! Wê ji te zahir bitin Şahê Emîn, Hêviya min wasîq e dê rabbitin Ahmedê mursel, ji te peyda bitin. Eşrefê Mexlûq û Siltanê Cîhan dê ji te peyda bitin bêşek bizan. Min ev di xewna xwe de dît, ez bendewarê vê me. Ahmed dê ji te be.

Heman mijar û rîwayet di mawlûda Haydarî<sup>65</sup>, mawlûda M. Zahîr Kardeşlik<sup>66</sup>, mawlûda Fudeylî<sup>67</sup> de cih girtine. Lê Fudeylî ev beş bi ser beşa piştî pêkanîna daweta Amîne û Ebdullah ve kiriye.

### **El-Babu’s-Samînu Fî Muahedetî’l- Yehûdî We Qasdîhîm Qetle Abdîllah**

Ev beşa ku Yahûdî ji bo Ebdullah bikujin ji Şamê derketina wan û heta nezîkî Mekkeyê hatina wan û ji bo kuştina wî xefk vedana wan vedibêje, di mawlûda Bateyî de navbera malikên 164–183yan vedigire.

Demê Ebdullah mezin bû, Yahûdîyan ji bo ku wî bikujin amadekarî kirin. Ehlê kitêbê, keşeyan û ehbaran (zaneyan) li hêviya keysa xwe bûn. 70 Yahûdî ji bo kuştina Ebdullah ji Şamê hatin. Ev kesên ku her yekî şervanekî baş e, ji bo kuştina Ebdullah sond xwarin û gotin “Heta Ebdullah neye kuştin yek ji me venagerê Şamê” û bi rê ketin. Li nêzikî Mekkeyê xefk vedan û bi dest bendemayîne kirin. Rojekê dîtî ku Ebdullah derketiye çolê bigere. Fersenda

<sup>65</sup> Haydarî, malikên di navbera 134-141ê de.

<sup>66</sup> Kardeşlik, r. 22-24.

<sup>67</sup> Fudeylî, r. 16-17.

ku li bendê bûn ketibû destên wan. Li dûv wî çûn. Heman rojê bavê Amîne, Wehb derketibû nêçîrê. Ji nişka ve dengê hat. Wehb bi aliyê deng hatî ve nêrî. Dît ku ew zilam nêzîkî Ebdullah dibin. Weke birek gur, dimeşîne ser Ebdulleh ve.

Lê belê Xwedê ji tişta wan dikir haydar bû. Di wê gavê de ferîstehên cilên kesk lixwepêçayî hatin û ew Yahûdî hemû kuştin û dîse bi paş ve veşeriyên. Wehbê ku ev tiştên qewimîn dîtî got “Heke qebûl bike, min Amîne da wî.”

Heman mijar di mewlûda Haydarî<sup>68</sup> de, di Mewlûda Kurdî<sup>69</sup> de, di mewlûda Fudeylî<sup>70</sup> de, di Ava Heyat<sup>71</sup> de û di mewlûda M. Zahîr Kardeşlik<sup>72</sup> de derbas dibe.

Di mewlûda Kardeşlik nivîsî de bûyer bi awayekî pir ecêb tê bidawîkirin:

“Hate dengê ey cuhûd terk hûn bidin  
Hûn li bavê min nikarin dest bidin.  
Nûr ji piştê Ebdullah hat bi der  
Şewq û qîrînek li wan dan bi ser.  
Agirek hanî cuhûd şewtan kirin  
Wan ji ser rûyê dinê wenda kirin.”

Yanê nûra ji piştê Ebdullah derketî bang li Yahûdiyan kir, xwest ku dest ji bavê wî berdîn û got hûn nikarin tiştekî ji bavê min bikin û hemû kuştin.”<sup>73</sup>

Di mewlûda Fudeylî de hatiye diyarkirin ku bi tenê deng hatiye, Yahûdî ji alî ruhaniyên ji asîmanan hatin ve hatine kuştin.<sup>74</sup>

### **El-Babu't-Tasî'u Fî Beyanî Tezwîcî Abdîllahî Bî Amîne**

Ev beş, zewaca Ebdullah û Amîneyê vedibêje, di mewlûda Bateyî de navbera malikên 184 – 233yan vedigire.

Malikên navbera 146 û 147an xwestina gelek keçên li Mekkeyê bi zewaca Ebdullah re vedibêjin. Di vê beşê de jî malika 211an qala mirina keçên li Mekkeyê dike. Li gorî malikê, şeva Amîne û Ebdullah zewicîn li Mekkeyê 100 qîzên ku bi zewaca wan hisiyane ji “xemgîniyê – hesûdiyê” mirine.

<sup>68</sup> Haydarî, malikên di navbera 142-160î de.

<sup>69</sup> Mewlûda Kurdî, malikên di navbera 99-113an de.

<sup>70</sup> Fudeylî, r. 12-13.

<sup>71</sup> Ava Heyat, r. 16-18, malikên di navbera 80-94an de.

<sup>72</sup> Kardeşlik, r. 20-21.

<sup>73</sup> Kardeşlik, r. 21.

<sup>74</sup> Bnr Fudeylî, r. 13.

Di navbera malikên 223 – 230î de tê vegotin ku şeva zewicîn put qulibîne, Şeytan deverû hatiye ser çiyayê Ebû Qubeys û bi dest qîrînê kiriye. Ên ji dunda wî jê pirsîne, gotine çî bû? Şeytên gotiye Amîne û Ebdullah zewicîn. Şeytan vedibêje ku êdî heyamê wan qediyaye û êdî heyamê Ahmed hatiye, ew hemû wê helak bibin, ummeta Ahmed wê bibe ummeta herî qenc.

Beşa zewacê di mewlûda Haydarî<sup>75</sup> de, di mewlûda Fudeylî<sup>76</sup> de, di Mewlûda Kurdî<sup>77</sup> de, di mewlûda M. Zahîr Kardeşlik<sup>78</sup> de jî cih girtiye. M. Zahîr Kardeşlik, di dawiya beşa dawetê de, şîret kiriye ku li salê carekê mewlûd were dayîn.

Di mewlûda Ava Heyatê de jî mijara zewacê cih girtiye.<sup>79</sup> Lê di mewlûda Ava Heyatê de, nivîskar şîretan li xwendevên dike û diyar dike ku rêyek ji yê şeytên a herî bibandor ji bo vê ummetê ji rê derxê, hezkirina ji cîhanê û jin e. Şeytên, salox daye zûrriyeta xwe ku bi bikaranîna van her du dafan misilmanan ji rê derxin. Nivîskar berdewam dike, bang li xwendevanan/guhdarvanan dike û van şîretan dike: Li dijî Şeytên hişyar bin, digel ‘aliman bin, bi tenê nemînîn, miha ji pêz veqetê gur dixwe, nimêjê îhmal nekin, ji heraman ji gunehên mezin xwe dûr bigirin, li dê û bavê xwe xwedî derkevin, mafên cîranan îhmal nekin.<sup>80</sup>

### **El-Babu’l-‘Aşîru Fî Beyanî Hemlî Amîne bî Resulîllahî Sallallahu ‘Aleyhî We Sellem**

Ev beş, maweya ducaniya Amîne û rewîtiya Ebdullah ji bo bazirganiyê û wefatkirina Ebdullah li Medîneyê vedibêje. Di mewlûda Bateyî de navbera malikên 234 – 258an vedigire. Di navbera malikên 234 – 246an de, qala xewnên Amîne dîtine dike.

Di vê beşê de tê diyarkirin ku Amîne di maweya ducaniya xwe de (di neh mehan de) her meh pêxemberek dîtiye (bi dorê, Adem, Şîr, Îdrîs, Nûh, Hûd, Îbrahîm, Îsmâil, Mûsa û Îsa) û van pêxemberan mizgîniya Hz Muhemmed li dayîka wî kiriye. Qala heman mijarê di mewlûda Haydarî<sup>81</sup>, mewlûda Kardeşlik<sup>82</sup>, mewlûda Kurdî<sup>83</sup>, mewlûda Fudeylî<sup>84</sup> û mewlûda Ava Heyatê<sup>85</sup> de hatiye kirin.

<sup>75</sup> Haydarî, malikên di navbera 182-202yan de.

<sup>76</sup> Fudeylî, r. 14-16.

<sup>77</sup> Mewlûda Kurdî, malikên di navbera 114-128an de.

<sup>78</sup> Kardeşlik, r. 24-28.

<sup>79</sup> Ava Heyat, r. 19-22, malikên di navbera 96-121ê de.

<sup>80</sup> Ava Heyat, r. 23-24, malikên di navbera 127-133yan de.

<sup>81</sup> Haydarî, malikên di navbera 220-233yan de.

Di mewlûda Ava heyatê de, di malikên paşê de, xewnek heyê. Ev xwen di mewlûda Bateyî de tune. Li gora vê rîwayetê Amîne di xewna xwe de ji aliyê ferîştehekê ve mizgînî girtiye. Bi vê mizgîniyê hatiye diyarkirin ku Hz. Pêxember wesîleya afirandina gerdûnê ye, tobeyên Adem û Hewwa ji bo wî hatine qebûl kirin, Hz. Nûh ji bo xatirê wî ji tofanê hatiye parastin, Hz. Eyûb ji bo xatirê wî ji nexweşiyê xelas bûye, Hz. Îsa ji bo xatirê wî ber bi asîman ve hatiye bilind kirin, Hz. Îbrahîm ji bo xatirê wî xelas bûye.<sup>86</sup> Di malikên mewlûda Ava Heyatê ên piştî van de, emrê “ji Qelemê re hatiye dayîn ku navê Hz. Pêxember binîvîse” jî weke berde wama vê xewnê hatiye vegotin, di heman deverê de hinek fezîletên din ên Pêxember hatine rêz kirin.<sup>87</sup>

Malikên mewlûda Bateyî ên di navbera 247 – 258an de, ji bo bazirganiyê birêketina Ebdullah, li Medîneyê wefat kirina wî û xemgîniya malbata wî tê vegotin. Heman mijarê, di mewlûda Haydarî<sup>88</sup>, mewlûda Kardeşlik<sup>89</sup>, mewlûda Fudeylî<sup>90</sup> û mewlûda Ava Heyatê<sup>91</sup> de cih girtiye.

### **El-Babu'l-Hadî ‘Aşere Fî Beyanî Wîladetî’n-Nebiyî Sallallahu ‘Aleyhi We Sellem**

Ev beş, jidayîkbûna Hz. Pêxember vedibêje, di Mewlûda Bateyî de, navbera malikên 259 – 283yan vedigire. Li gora Bateyî di dema jidayîkbûna Hz. Pêxember de, çar jin, Hewwa, Sara, Asiye û Meryem tîne kêleka Amîneyê. Di dema jidayîkbûnê de pir bûyerên mucîzewî tîne holê. Ferîşteh bi tesbîhan tîne menzelê, stêrk dikevin aliyê rast û çepê Amîneyê. Hemû cîhan bi nûrê tije dibê. Amîne rojava û rojhilatê dibîne, dibîne ku li wan deran û li Ka’beyê alên kesk li ba dikevin. Xwedê emrê dide Cebraîl, Cebraîl mizgînî dide ehlê asîman û rûyê ‘erdê. Deriyê dogehê vedibe. Ferîşteh kom bi kom tîne Mekkeyê.

<sup>82</sup> Kardeşlik, r. 29-30.

<sup>83</sup> Mewlûda Kurdî, malikên di navbera 129-148an de.

<sup>84</sup> Fudeylî, r. 17-18.

<sup>85</sup> Ava Heyat, r. 24-26, malikên di navbera 135-145an de.

<sup>86</sup> Ava Heyat, r. 26-27, malikên di navbera 147-157an de.

<sup>87</sup> Ava Heyat, r. 28-29, malikên di navbera 159-167an de.

<sup>88</sup> Haydarî, malikên di navbera 204-219an de.

<sup>89</sup> Kardeşlik, r. 30-32.

<sup>90</sup> Fudeylî, r. 18-19.

<sup>91</sup> Ava Heyat, r. 29-31, malikên di navbera 169-180yê de.

Amîne, dibêjê ku wê saetê tî bûye, şerbeteke mîna şîr spî û mîna hingiv şêrîn dane wê. Amîne wiha dibêjê: min ew vexwar û tîbûna min çû. Teyrikeke spî hate kêleka min, destê xwe ser min re bir. Hingî Muhammed Mustafa çêbû.”

Heman mijar û rîwayet di mewlûda Haydarî<sup>92</sup>, mewlûda Kardeşlik<sup>93</sup>, mewlûda Fudeylî<sup>94</sup> û mewlûda Ava Heyatê<sup>95</sup> de jî cih girtine.

### **El-Babu's-Sanî 'Eşere Fî Mebhasî Nîdaî'z-Zerratî 'Înde'l-Wîladetî bî't-Turabî**

Ev beş, di mewlûdê de beşa herî xweybandor e. Di mewlûda Bateyî de navbera malikên 283 – 289an vedigire.

Ev beş pêşwazîkirina hemû mahlûqatan ji ber hatina Hz Pêxemberê bo dinyayê dişayesîne (teswîr dike). Dema mewlûd tê xwendin, ku dor hate vê beşê yên li wir amade ne radibin ser piyan û malikên ku bi *Merheba* dest pê dikin dixwînin.

Beşa “Merheba”yê, di mewlûda Bateyî de navbera malikên 271 – 282yan, di mewlûda Kardeşlik de, rûpelên 35 – 36an, di ya Fudeylî de rûpela 21ê, di mewlûda Kurdî de navbera malikên 169 – 185an de cih digire.

Di mewlûda Fudeylî de piştî beşa *Merhebayê* di’ a hatiye biservekirin.<sup>96</sup>

Di Mewlûda Kurdî de li şûna “Merheba”yê malik bi hevokên “Tu Bi Xêr Hatî” dest pê dike. Mewlûda Kurdî, bi jidayîkbûnê diqede. Piştî beşa *Merhebayê* re, di navbera malikên 186 – 206an de ligel wesfvedanê û di’ a ve salat û selam li ser Hz. Muhammed tên anîn. Dûv re di navbera rûpelên 20 – 26an de di’ aya piştî mewlûdê heye.

Mewlûda Haydarî jî, bi jidayîkbûnê diqede. Beşa *Merhabayê* ji 12 malikan pêk tê. Lê li şûna peyva “Merheba”yê, peyva “Hat”ê hatiye bikaranîn. Di navbera malikên 283 – 312yan de beşeke dî heye li vir wesfê Hz. Pêxember tên vegotin. Di her du rûpelên dawî de jî di’ aya piştî mewlûdê heye.

Mewlûda Ava Heyatê jî, li vir bi beşa jidayîkbûnê diqede û derbasî di’ aya mewlûdê dibe. Di mewlûda Ava Heyatê de beşa “Merheba”yê tune ye.

<sup>92</sup> Haydarî, malikên di navbera 238-270yî de.

<sup>93</sup> Kardeşlik, r. 32-35.

<sup>94</sup> Fudeylî, r. 19-20.

<sup>95</sup> Ava Heyat, r. 31-36, malikên di navbera 182-220î de.

<sup>96</sup> Bnr Fudeylî, r. 22-23.

---

**El-Faslu'l Ewwelu Mîn Mebhasî'r-Reda'î Fî Beyanî'l-Îrhasatî'l-Waqî'etî  
Leylete'l-wîladetî**

Ev beş, jidayîkbûna Hz. Pêxember û mucîzeyên piştî jidayîkbûna wî pêk hatine vedibêje. Di mewlûda Bateyî de navbera malikên 299 – 316an vedigire.

Di navbera malikên 299 – 309an de tê vegotin ku çawa Hz. Pêxember ji dayîk bûye, çûye secdeyê, tiliya xwe ber bi asiman ve zivirandiye, ewreke spî hatiye rahijtiye wî û wenda bûye. Tê vegotin ku pitik bi awayekî pêçayî dîsa vegehiye û ewreke din rahijtiye wî biriyê. Amîne dibêje ku dengê hatiye guhê wê: “Li cîhanê bigerînin, li behr û bejayan bigerînin.

Dîsa di van malikan de tê vegotin ku jidayîkbûna Hz. Pêxember, ji Pêxemberên din re hatiye ragihandin, xanî bi teyrikên reng bi reng tije bûye. Hz. Pêxember ji aliyê kesên mîna rojê dibiriqin ve hatiye şûştin û pêçan. Li gora ku Melayê Bateyî di malika 309an de nivîsiye hed û hesabê mucîzeyên dema jidayîkbûnê tune ye. Lê Bateyî tenê bi kurtasî nivîsiye.

Di mewlûda Fudeylî de mucîze, di rûpelên 23 – 24an de derbas dibin. Lê di mewlûda Kardeşlik de ev beş di navbera rûpelên 37 – 39an de cih digire. Di mewlûda Kardeşlik de tê diyarkirin ku sibeha Hz. Pêxember ji dayîk bûye, yekî Yahûdî (cihû) ji Mekkeyîyan pirsîye ka wê şevê zarokî ji dayîk bûne an na. Ev rîwayet di mewlûdên din de tune ye.<sup>97</sup>

**El-Faslu's-Sanî Fî Beyanî Eyaţîllahî Reaha Abdulmuttalîb Sebîhete Wîladetîhî  
Sallallahu 'Aleyhî we Sellem**

Ev beşa ku mucîzeyên şeva jidayîkbûyîna Hz. Pêxember pêk hatine vedibêje, di mewlûda Bateyî de navbera malikên 317 – 337an vedigire.

Di vê beşê de derbas dibe ku Ka'be çûye secdeyê. Ferîştehan, Ka'be bi misk û ava gulan şuştîye. Safa û Merwe çûne secdeyê, ji welidîna wî pê de sê rojan heta Ferîştehan ew nedîtiye, Abdulmuttalîp jî Hz. Pêxember nedîtiye û Amîne di xewna xwe de Helîmeyê Sa'diyeyê ji wî re weke dêşîr dîtiye.<sup>98</sup>

**El-Faslu's-Salîsu Fî Beyanî Mecî'î Helîmete Îla Mekkete Lî'axzî'n-Nebiyî  
Sallallahu 'Aleyhî We Sellem Lî'r-rîda'î**

---

<sup>97</sup> Ji bo rîwayetê bnr. Kardeşlik, r. 39.

<sup>98</sup> Ji bo van beşan ji bil vê mewlûdê bnr Kardeşlik, r. 37-39.



Ev beş, hatina Mekkeyê ya Helîme û jinên din ji bo zarokên şîr bidin bibînîn vedibêje. Di mewlûda Bateyî de navbera malikên 338 – 396an vedigire.

Helîme wisa dibêje: “Em bi hevalên xwe re çûbûn geliyekî. Ji nişka ve dengê em nizanin ji ku ve hat, wiha got: “Niha herine Mekkeyê, ey jinino! Ji bo welidîna mezin pîroz bin, dayîka ew zarokê jidayîkbûyî wergire bila dilşad be.”

Dîsa di vê beşê de tê vegotin ku ji Helîme re di xewna wê de hatiye gotin ku ji çemekî mîna şîr spî û şêrîn vexwe, wê jî vexwariye, bi vî awayî singên wê bi şîr tije bûye û jê re hatiye gotin ji kesî re xewna xwe nebêje. Di heman cihî de tê vegotin ku dema ber bi Mekkeyê ve bi re ketine, merkebê wê hêdî meşiyaye û ji vê yekê, ji karwanê paş ve maye. Wê gavê yekî qama wî dirêj bi nûr merkeb ve îşaret kiriye û gotiye “Ey Helîme, bilezîne! Mizgînî li te! Tu yê Muhemmed wergirî. Deweya wê lezandiye û gihaye karwanê.

Di vir de tê vegotin ku Abdulmuttalîb dengê bihistiye ku gotiye hûn ji bilî Helîmeyê, Muhemmed nedine ti kesî.

### **El-Faslu’r-Rabî’u Fî Beyanî Rucû’î Reqbî Benî Sa’dîn Mîn Mekkete Îla Mewtînîhîm**

Di vê beşê de, vegeftina Helîme û ên ligel wê a welatê wan tê vegotin. Di mewlûda Bateyî de navbera malikên 397 – 421an vedigire.

Li gorî vê beşê dema Helîme vedigerin welatê xwe merkebê wan, berî ji Mekkeyê here, ber bi Ka’beyê ve sê caran çûye secdeyê, dûv re ji wir çûye. Merkeb, di vegeftinê de bi lez meşiyaye ji bo vê yekê kesên di karwanê de pirsîne û gotine, çi bûye ji merkebê, dema em hatin hêdî hêdî dimeşiya çawa dibe ku digel niha barê wê girantir e jî derbasî pêşiya karwanê bûye.

Li ser vê yekê merkeb hatiye ziman, gotiye, di çûyîna min de ti halê xerîb tûneye. Gotiye ku yê li ser piştta wî, Resûlê Rebbê ‘Erşê ye, Seyyîdê her tiştên Xwedê afirandî ye û ew kes bixêrtirînê mirovan e.<sup>99</sup>

Kesên din ên karwanê ji ber ku dibetiya ku merkeb biaxive nefikirîn hemûyan fikirîn ku ew deng xeyalek e.

<sup>99</sup> Fudeylî, bûyera dayîna dêşîrê ya Hz. Pêxember nêzîkî temamê mijarê bi heman awayî daye. Bnr Fudeylî, r. 24-26.

Helîme tiştên di rê de dîtî vedibêjê: Em derbasî pêşiya karwanê bûn. Min 40 keşeyên li kêleka mezinên xwe yên dînî dîtin. Vî merivê bicibe ji keşeyan re qala nêzîkbûna çaxê Pêxemberê dawî û xuyabûna îşaretên (nîşan) wî dikirin. Ez ji wan derbas bûm. Roniya nûra Muhemmed bilind bû. Uskufê Mezin: Hawar! Va Ew e! Werin em bi şûran bikujin. Keşeyan şûrên xwe kişandin, li dûv me hatin, nêzîk bûn. Min dît ku Muhemmed li asîman dinêrê. Ji asîman agirekî mîna birûskê hat, ew hemû şewitandin, kuştin.

Di wê navê de dengêkî ji hatîf<sup>100</sup> hat: “Uhlîke’l-Kuffare mîn Narîl-Qehhar”.

Fudeylî dema vê bûyerê vedibêje, dibêje merkeb pir bi lez çûye û ketiye pêşiya tevan. Fudeylî di vê navê de qala bûyereke xelaskirina zarokêkî ji bîrê û bûyereke li ser kahîna (bi wan re eleqedar) dike. Dibêje, Piştî her du bûyer jî diqedin, karwan gihaye Helîme û malbata wê û hemûyan bi hev re rêya xwe domandine.<sup>101</sup>

#### **El-Faslu’l-Xamîs Fî Beyanî Mu’cizatîhî Sallallahu ‘Aleyhî we Sellem Waqî’etî Haletî Sebawetî Bî Benî Sa’d**

Ev beş, mu’cîzeyên dema zarokiya Hz. Pêxember vedibêje. Di mewlûda Bateyî de navbera malikên 422 – 490î vedigire.

Ji van malikan, navbera 444 – 452yan de, tê vegotin ku darên ew didît silav didanê, ajalên hov, şêran tu ziyar nedigehandin wî, li kêleka wî tebitîfînê, bî wî re axivîne. Li gorî beşê, Hz. Pêxember, destê xwe daye miheke lingê wê şikestî û mih baş bûye.

Bûyerên bi Hz. Pêxember re têkildar ên siruştî û rîwayetên bi ajalan re têkildar bi awayekî hevşib di mewlûda M. Zahîr Kardeşlik û di mewlûda Fudeylî de jî cih girtine.<sup>102</sup>

Di navbera malikên 477 – 480yî de tê vegotin ku Helîme, di zarokbûna wî de Hz. Pêxember biriye cem kahîn. Kahîn ji dora xwe re gotiye, wî bikujin ew ê ola Hubel ji holê rake, ji nişka ve zilamekî zexm derketiye holê û kahîn bi şûr kuştiye, kahîn û yên dora wî helak bûne, Helîme, Muhemmed aniye malê, cem dayîka wî.

Ev mijar, ji alî M. Zahîr Kardeşlik ve bi awayekî cihe hatiye vegotin. Li gora mewlûda Kardeşlik, kahîn, Muhemmed hambêz dike, dibêje min û wî bikujin. Qewmê kahîn bi şûrên

<sup>100</sup> Yekî ku ji xeybê diaxive, dengê wî tê bihistin lê ew bi xwe nayê dîtin.

<sup>101</sup> Fudeylî, r. 27.

<sup>102</sup> Bnr Kardeşlik, r. 44-45; Fudeylî, r. 28-29.

xwe bi ber wî ve dibezin, Muhemmed li asîmana dinêrê, dûv re derdor dibe toz û bablîsok, tu kes fehm nake çî bûye. Helîme dibêjê ku yekî bejnzirav pihîn li kahîn daye û gotiye wê, bi lez zarokê bibe ji bapîrê wî re.<sup>103</sup>

Di mewlûda Bateyî de navbera malikên 481 – 485an de jî, tê vegotin ku, dema Helîme û Muhemmed ji cem kahîn vejerihan pîrekeke ku zaroka wê ketî bîrê de dîtine, Muhemmed bi tiliya xwe îşaretî bîrê kiriye, av bilind bûye, zarok derketiye û silav daye Muhemmed.

Xelaskirina zarokê ji alî Kardeşlik ve bi awayekî hevşib hatiye vegotin. Fudeylî jî ligel bi awayekî hevşib vegotiye jî weke/mîna li jor hatiye diyarkirin dema vê buyerê di mewluda wî de cuda ye. Li gorî wî dema Helîme û hevalên xwe ji Mekkeyê vedigeriyên ev buyer qewimiye.<sup>104</sup>

Di navbera malikên 488 – 490î yên Bateyî de, tê vegotin ku, Helîme ji bo Muhemmed bibe Mekkeyê amade kiriye, dema ketine Mekkeyê dengêkî bi awayê “Ey Mekke! Ê ji ba te hatî, hate ba te.” bihîstiye.

### **El-Faslu’s-Sadîsu Fî Beyanî Âadetî Helîmetî an-Nebîyye Sallallahu ‘Aleyhî we Sellem Îlâ Mekkete We’t-Teslîmî ilâ Ummîhî Amîne**

Ev beş, bûyera ku Helîme Hz. Muhemmed aniye Mekkeyê û spartiye dayîka wî vedibêje. Di mewlûda Bateyî de navbera malikên 491 – 539an vedigire.

Ji van di navbera malikên 493 – 517an de, tê vegotin ku Helîme, Hz. Pêxember aniye Mekkeyê, ber bi Ka’beyê ve hatine, nêzîkê Ka’beyê bûne, Helîme dengêk bihîstiye: “Ey Ka’be! Ey Harem! Yekî ‘ezîz hate cem te. Cananê her du ‘aleman hat.” Helîmê li milê xwe yê çepê û li milê xwe yê rastê nêriye lê ti kes nedîtiye, Hz. Pêxember daniye derekê, dest bi yê ku bang kirî geriyaye, piştî ti kes nedît vejeriyaye cihê xwe lê nêriye ku Hz. Pêxember ne li cihê xwe ye.

Helîme, dest bi lêgerînê kiriye lê ti kes nedîtiye. Zilamekî pîr jê pirsîye ka li çî digere, wê jî mesele vegotiye. Zilamê pîr, ew biriye cem pûtê Uzza. Zilamê pîr ji pût re secde kiriye û ji pût, cihê Hz. Pêxember pirsîye. Pûtê Uzza, gava navê Hz. Pêxember bihîst secde kiriye û

<sup>103</sup> Ji bo vegotîneke cuda ya heman buyerê bnr Kardeşlik, r. 43-44.

<sup>104</sup> Kardeşlik, r. 42-43; Fudeylî, r. 27.

dest bi axaftinê kiriye, ji bo ku zilamê pîr secde kiriye, pê de xeyidiye û gotiye pêxember hatiye ku dawiyê li heyamê wan bîne.

Di navbera malikên 527 – 539an de, tê diyarkirin ku dema Abdulmuttalîb dibihîze Hz. Pêxember wenda bûye, tê Ka'beyê lava ji Xwedê dike û dema ew li Ka'beyê ye, dengê wiha hatiye bihîstin:

“Zû here Tuameya xwedîşeref, tê wî li bin welatê Yemameyê bibînî.” Abdulmuttalîb çûye wê deverê û Hz. Pêxember li wir dîtîye. Mewlûda Bateyî li vir bi dawî dibe.

Di mewlûdên Fudeylî û Kardeşlik de jî heman mijar heye. Lê mewlûda Kardeşlik, bûyerê berfirehtir vedibêjê, li şûna pûtê Uzza, Helîme û zilamê pîr çûne cem kahînekî, ji kahî cihê Hz. Pêxember pirsîne. Li gora mewlûdê, Kahî navê “Muhemmed” bihîstîye lerizîye û tirsîyaye, ji Helîme re gotiye, li wî negere, wendabûna Muhemmed baş e, cîhan ji wî xelas bûye. Helîme, ji wir qetiyaye û çûye cem Abdulmuttalîb û tiştên bi serê wê hatine jê re vegotiye. Abdulmuttalîb, dengê Helîme birî û ji bo nebêjê Amîne ew hişyar kir. Abdulmuttalîb û Helîme, her du ligel hev diçine cem Ka'beyê. Abdulmuttalîb li wir di'a dike. Dema di'a dike dengê tê bihîstin û tê gotin ku Hz. Pêxember li Yemameyê ye, ferîşteh li dora wî kom bûne.<sup>105</sup>

Digel ku mewlûda Bateyî bi bûyera vegeerîna Mekkeyê diqede, mewlûda Kardeşlik û ya Fudeylî yên ku bi heta vir dişibine mewlûda Bateyî, hetta carinan rîwayetîne ji yên di mewlûda Bateyî de berfirehtir dihewînin berdewam dikin.

Di mewlûda Kardeşlik de, mayîna Hz Pêxember a piştî van heyaman re bi dorê, li cem dayîka xwe, bapîrê xwe, apê xwe, zewaca wî, pêxemberbûna wî, ceng û wefata wî bi kurtasî tê vegotin. Dûv re qesideyekê ku mijara wê wesfvedana Hz Pêxember e cih digire. Di dawiyê de jî di'aya mewlûdê hatiye biservekirin.

Di mewlûda Fudeylî de tê vegotin ku, Hz. Pêxember û dayîka xwe çûne Medîneyê, li wir Yahûdîyan fehm kirine ku ew ê di pêşerojê de bibe pêxember. Cariye gotiye Amîne divê zû Hz. Pêxember ji vir bibin, li ser vê yekê bi rê ketine, Amîne di rê de emrê Xwedê dike/wefat dike. Mewlûd, bi axaftina kalê wî cenabî, Abdulmuttalîb û zarokên xwe ji bo piştî wefata Abdulmuttalîb, kesê li Hz. Pêxember xwedî derkeve diyar bibe û bi pêjirandina Ebû

<sup>105</sup> Kardeşlik, r. 46-48, Ji bo vegotîneke hevşib a Fudeylî bnr Fudeylî, r. 30-32.

Talîb diqede. Mewlûda Fudeylî bi malika selewatê bi dawî dibe. Beşa di'ayê di mewlûda Fudeylî de tune. <sup>106</sup>

Wek li jor jî diyar bû dema mewlûda Melayê Bateyî û yên li ber vê mewlûdê hatine nivîsîn werin senifandin (dabeşkirin) ev mijar tîn dîtin: Afirandina gerdûnê, Nûra Muhammed, afirandina Hz. Adem, 'Ebdullah, Yehya Pêxember, jiyana Hz. Pêxember.

### **3. Mewlûdên Ne di bin Bandoriya Mewlûda Nebî de Hatine Nivîsîn**

Nivîskariya mewlûdê hîn jî didome. Di vê beşê de mewlûdê ne di bin bandoriya Bateyî de hatine nivîsîn wê bînan danasîn. Weke ku ji van rûpelan jî wê were xûya kirin ku ev mewlûd hemû di serdema me de hatine nivîsîn. Em dikarin van mewlûdan wiha rêz bikin:

#### **3.1. Mewlûda Şerîf Ji Ewwel Heta Axir Rehberê Xelasî Hz. Muhammed (S.A.V)<sup>107</sup>**

Nivîskarê vê mewlûdê M. Mustefayê Mele 'Eliyê Ezdarî ye. Di beşa mewlûdê a dawî de hatiye diyarkirin ku mewlûd di dîroka 14/ 03/ 2003yan de qediyaye. Çapa hatî vekolandin ji aliyê weşanên Îhsan ve hatiye çapkirin. Mewlûd, weke hinek mewlûdê li van salên dawî derketine tîpên 'Erebî û Latîni ligel hev hatiye çapkirin. Di vê lêkolînê de tîbîniya mewlûdê li ser beşa mewlûdê ya Latîni esas (binyat) hate girtin.

Mewlûd, bi jidayîkbûna Hz. Pêxember diqede, piştî jidayîkbûna wî ango jiyana wî venabêje, tevî malikên selewatan ji 333 malikan pêk tê. Beşên mewlûdê nehatine binavkirin, derbasbûna di navbera mijaran re, bi van malikên selewatan pêk tê:

“Em ji ‘işqa can û dil ba xweş kelam  
Her bibêjin esselatu we's-selam”

Malika mewlûdê ya pêşî wiha ye:

“Bê jimar hemd û senaê qelb û cân  
Em didin boy Xaliqê kewn û mekân”

Malika mewlûdê ya dawî jî wiha ye:

<sup>106</sup> Fudeylî, r. 32-35.

<sup>107</sup> M. Mustafa yê Mela Aliyê Êzdarî, Mewlûda Şerîf Ji Ewwel Heta Axir Rehberê Xelasî Hz. Muhammed (S.A.V), Weşanên Îhsanê, İstanbul, Tebax 2005.

---

“Ser xêrê be ev buhar û ev newroz  
Sed pîroz û sed pîroz û sed pîroz”

Mewlûda Rehberê Xelasî, piştî beşên tewhîd û selewatan<sup>108</sup> bi afirandina Hz. Adem, dest bi mewlûdê dike, lê belê weke Mewlûda Bateyî û ên bi wî şeweyî bûyeran berfireh venabêjê. Dûv re girîngî û feydeyên mewlûdê vegotiyê, di vê beşê de jî mîna beşa din bûyer û rîwayet berfireh venegotine.<sup>109</sup> Dûv re derbasî mijara afirandinê bûye, li vir weke mewlûdên din rîwayet dûvdirêjî hev nekirine. Nivîskar dûv re derbasî beşa afirandina Hz. Adem bûye, ev beş bi awayekî dişibihe çîroka Hz. Adem a ku di Qur’ana Kerîm de hatiye vegotin. Di mewlûdê de qala dara qedexe jî kiriye lê belê têgîniya “dara genim” bi kar neaniye.<sup>110</sup>

Dûv re derbasî beşa şiyandina Hz. Adem û Hz. Hewwa ya bo cîhanê bûye. Cih daye çîroka Habîl û Qabîl. Hatiye diyarkirin ku ji heyamê Habîl û qabîl ve ye mirovahî weke heq û batil veqetihaye û tekoşîna navbera wan du beşan heta îro didome. Hatiye diyarkirin ku mirov ji rêya heq derketine, car caran pêxember hatine şiyandin, qewmên bi ya pêxemberan nekirî hatine helakkirin. Navê pêxemberên ku navên wan di Qur’anê de derbas dibin rêz kirine, piştî ku selewat li ser van pêxemberan û Hz. Muhammed (sav) dane ev beş qedandiyê.<sup>111</sup> Dûv re rewşa mirovahî ya berî Hz. Pêxember vegotiyê.<sup>112</sup> Piştî ev beş qediyaye derbasî beşa secereya Hz. Pêxember bûye.<sup>113</sup> Piştî ev der jî qediyaye derbasî beşa bavê Hz. Pêxember, ‘Ebdullah û dayîka wî Amîne bûye. Diyar kiriye ku ‘Ebdullah xwediyê exlaqekî xweş e û bi Amîne re zewiciye, di dawiya vê beşê de ji wefata ‘Ebdulleh vegotiyê.<sup>114</sup> Nivîskar ji vir derbasî beşa jîdayîkbûna Hz. Pêxember bûye,<sup>115</sup> dûv re jî derbasî beşa Merhebayê bûye. Li vir li şûna Merheba bi têgîna “sed pîroz” dest bi rêzan kiriye.<sup>116</sup>

Piştî vê beşê derbasî beşa ku selewat ji Pêxemberê me re tîn dayîn bûye, di selewatan de dema xîtabê Pêxemberê me kiriye, piştî her du xîtabê pêşî her xîtabê bi wesfekî (sifat) Pêxemberê me dest pê kiriye û ji Hz. Pêxember re bi awayê “es-selatû ‘aleyk, es-selamû

---

<sup>108</sup> Êzdarî, r. 3-5.

<sup>109</sup> Êzdarî, r. 3-5.

<sup>110</sup> Êzdarî, r. 9-13. Ji bo qiseya Hz Adem bnr r. 10-11.

<sup>111</sup> Êzdarî, r. 13-16.

<sup>112</sup> Êzdarî, r. 16-18.

<sup>113</sup> Êzdarî, r. 18-20.

<sup>114</sup> Êzdarî, r. 20-23. Li vir mijara Hz Yehya û cilê wî tune ye.

<sup>115</sup> Êzdarî, r. 23-25.

<sup>116</sup> Êzdarî, r. 25-26.

‘aleyk” selewat hatiye dayîn.<sup>117</sup> Di beşa dawî de di’aya mewlûdê heye.<sup>118</sup> Digel ku piştî beşa bi tîpên latînî de tûneye, di dawiya mewlûdê ya bi tîpên ‘Erebî de di’aya mewlûdê bi zimanê Erebî ya ji dû rûpêlan pêk tê hatiye biservekirin.<sup>119</sup>

Mewlûda Rehbera Xelasî ji ber van taybetiyên xwe, ji mewlûda Bateyî gelekî cihê ye. Zimanê wê li gora ya Bateyî bêhtir herikbar e. Di beşa Hz. Adem û afirandina wî de hin malik ayetên Qur’ana Kerîm bi bîr dixin. Wek mînak malika di rûpêla yazdehemîn de, di rêza heftan de, “Em nizanin, ‘ilmê me pê nîne lew / Em dizanin ‘ilmê te ew da me hew” dişibihe vê ayeta Beqerayê: “Melayîketan got: Xwedayê me! Em te ji hemû kêmasiyan pak didêrin, ji tiştê te bi me dabe zanîn pê ve tu zanîneke me nîn e. Bi rastî her tu yî yê ‘Elîm, Hekîm.” (Sûreyê Beqere, 2/32).

Di beşên destpêkê yên vê mewlûdê de şîretên derheqê exlaqê baş, rêzgirtina Hz. Pêxember û dilsoziya Îslamê de jî hene. Mewlûda Ezdarî, bi rîwayetên ku bikartîne dişibihe mewlûdên serdema me, bi şeweya xwe dişibihe mewlûdên klasîk. Taybetiyên du heyaman di nav xwe de dihevin.

### **3.2. Nezma Şêrîn Der Mewlîd û Sîreta Resulê Emîn**

Ji alî Mele Muhemmed el-Xursî ve hatiye nivîsandin.<sup>120</sup> Di dawiya mewlûdê de “Hicrî 1428” hatiye nivîsîn. Ji vê nivîsê tê fêmkirin ku Mewlid di 2007ê mîladî de hatiye nivîsîn.

Peyva “sîret”ê ya di sernavê “Nezma Şêrîn di Derheqê Mewlid û Sîreta Resulê Emîn” nîşan dide ku mewlûd bi zêdeyî li ser exlaq e. Mewlûd, ji 31 rûpêlan pêk tê û tenê bi tîpên ‘Erebî hatiye nivîsîn, tevî malikên selewatan ji 257 malikan pêk tê. Nivîskar, di pêşgotina bi zimanekî herikbar hatî nivîsîn de, diyar dike ku dixwaze mewlûdeke ji sîretê (exlaq) pêk tê, binivîse.

“Xalî be ewê ji ze’îf û mewdu’  
Cem zane(zana) bibî meqbul û mesmu’<sup>121</sup>

<sup>117</sup> Êzdarî, r. 26-28.

<sup>118</sup> Êzdarî, r. 28-30.

<sup>119</sup> Êzdarî, r. 31-32.

<sup>120</sup> Molla Muhemmed el-Ğursî, *Nezma Şêrîn Der Mewlid û Sîreta Resulê Emîn*, cihê çapê tune ye, Çapa yekem, 2008.

<sup>121</sup> *Nezma Şêrîn*, r. 3.

Ji vê malikê jî diyar dibe ku ev mewlûd riwayetên ze'îf nahewîne, mewlûd, bi awayekî ji aliye 'Alîman ve were pêjirandin, wê were amade kirin. Ji bilî vê jî bi malika:

“Xaya mewlûdê sîretê nasîn

Xwe b'hubbu mutabeet xelaskin,<sup>122</sup> jî diyar dike ku armanca vê mewlûdê danasîna Hz. Pêxember, hezkirina ji wî û rêzgirtina bo wî bibe wesîleya xelasiyê ye.

Malikên ji bo selewatan ên vê mewlûdê bi pênc awayî tî dayîn û her awayekî selewatan di navbera pênc beşan de, di beşekê de tê dubarekirin.

“Yek selat kî kesê ku bîne

Deh selat Xwedê biserde tîne” (beşên 1, 6, 11, 16 û 21ê.)

“Allah û melek selatê tînin

Hûn jî pir bidin birayê mu'mîn” (beşên 2, 7, 12, 17 û 22yan)

“Allah û melek didin selatê

Hûn jî pir bidin gelfî civatê” (beşên 3, 8, 13, 18 û 23yan)

“Deh selat bira kesê ku bîne

Sed selat Xwedê biserde tîne” (beşên 4, 9, 14, 19 û 24an)

“Ew kesê ku sed selatê bîne

Wê Xwedê hezar biserde tîne” (beşên 5, 10, 15, 20 û 25an)

Malikên mewlûdê ên pêşîn û dawîn jî wiha ne:

Malika pêşîn:

“Hemdê ez dikim ji Zatê Barî

Lutfa wî li ser me tim dibarî.”

Malika dawîn:

“Hubba wî tu Xweda bidî herkes

Hem nazim û hazir ta bibên bes”

<sup>122</sup> *Nezma Şêrîn*, r. 3.



Piştî malika selawatê derbasî beşa di'ayê bûye, di pênc rûpêlê dawî de di'ayeke bi 'Erebî hatiye biservekirin.

Di mewlûdê de di derheqê meseleya afirandinê, jiyana Hz. Adem, mewlûd û xwendina mewlûdê de rîwayet an jî daxuyanî tune ne. Bi van taybetiyên xwe ve, mirov dikare *Nezma Şêrînê*, weke siyereke bi awayê nezmê hatî nivîsîn qebûl bike. Ji sernavên beşên pîrtûkê jî ev tê fehm kirin. Sernavên beşan wiha ne:

Piştî beşên pêşgotin û destpêkê re beş wiha hatine rêzkirin: “Dewra Cahiliye”, “Wîladeta wî”, “Neseba wî”, “Rabûna wî”, “Wefata Diya wî”, “Sefera Şamê”, “Zewaca wî bi Xedîce re”, “Nûkirina avahiya Ka'beyê”, “Nuzûla Wehyê”, Eşkerekirina De'wê”, “Sala Huznê”, “Îsra û Mî'rac”, “Bi'eta Aqabe”, “Hîcret”, “Avakirina Civakê”, “Sulha Hudeybiye”, “Bicîhbûna Îslamê”, “Wefata wî”, “Îdara dewletê”, “Ewsafê wî yê Zahir, Exlaq û Xûyê wî”, “Mu'cîzatê wî”, “Di'a”

Di vê mewlûdê de car caran ji ayetan îlham hatiye girtin:

“Emrê heq dihat ew bi xwendin  
Hûn pir bixwênin birayên mu'mîn”

Bi van malikan û ên ditjibihin van, şîret jî tên kirin. Di vê malikê de îşaretî eyata Qur'anê ya ewil nazîlbûyî (Sureyê el-'Eleq, 96/1) dike û girîngiya xwendinê diyar dike.

Mewlûda *Nezma Şêrîn*, ji ber ku jiyana Hz. Pêxember bi malikan vedibêjê û dibe ku ji bo vê be li şûna dîrokê, temenê Hz. Pêxember diyar dike û bûyerên wê salê qewimîn vedibêjê. Bûyerên piştî pêxembertiye re bi diyarkirina sala koçî (hicrî) vegotiyê. Yanê digel ku bi malikan hatiye nivîsandin, bûyerên di jiyana Hz. Pêxember de bi awayê nezmê tên ragihandin. Sazkirina mewlûdê ya bi vî awayî, ji bo xwîner û bihîzerê mewlûdê, sere sere (pir hindik) be jî dibe wesîleya hînbûna agahiyên siyerê. Weke mînak, kesekî beşa Peymana Hudeybiyeyê ya ku ji 10 malikan pêk tê bixwîne hînî pêşveçûna dînê Îslamê ya pir lez dibe. Kesên mîna Xalîd b. Welîd, Amr b. As, Osman b. Talha bûne misilman, ji cihên/welatên cuda re name hatine şiyandin, kesên mîna Kîsra, Muqawqîs, Necaşî, dînê Îslamê qebûl kirine, hinekan jî qebûl nekirine. Dîse di heman beşê de hîn dibe ku Mekke di sala heştêmîn a koçî (Hicrî) de hatiye fethkirin ji cihên/welatên din mirov hatine bûne misilman.<sup>123</sup>

<sup>123</sup> *Nezma Şêrîn*, r. 16-17.

Bi van taybetiyên xwe, mirov dikare vê mewlûdê weke pirtûka dersa siyerê bi kar bîne. Tê zanîn ku di rêbaza medreseyan Kurdan de metnên girîng ji bo werin jiberkirin bi awayê malikan dihatin nivîsandin. Ev mewlûd jî wê heman erkê pêk bîne. Lewra weke ku ji sernavên beşan jî tê fehmkirin, hemû mijarên siyerê dihewîne. Lê belê di dawiya her beşê de daxwaziya selewat dayîne û di beşa di'ayê de bi awayê:

“Rehma xwe li ser ummetê ram ke

Bîlhessa li gûhdaran tamam ke” kirina di'ayê, dide xuyakirin ku weke mewlûdê hatiye nivîsandin.

### 3.3. Mewlûda Pêxember

Navê nivîskar Mele Silêman Kurşun e. Ev mewlûd, yek ji wan mewlûdan e ku di demeke nêzik de hatiye nivîsandin.<sup>124</sup> Bi awayê ku tîpên bi erebî û latînî ligel hev in hatiye çapkirin. Bêyî istîlahên/têgînên dîni mirov dikare bibêje, bêjeyek jî bi zimanê Erebi nehatiye bikaranîn. Ev mewlûd tevî malikên ku gotina selawatan divên ji 286 malikan pêk tê. Taybetmendiya wê ya herî girîng ev e ku bêtirî ji vegotina jiyana Hz. Pêxember cî daye exlaqê wî cenabî. Kurşun, mewlûda xwe de, li ser taybetmendiyan exlaqî ya Hz. Pêxember, li ser tîkiliyan wî hezretî yê bi malbata xwe, bi cîranên xwe û bi civaka xwe re zêde rawestiyaye. Hedîsên ku pêwendîdarê mijarê ne, li bin sernava wê mijarê hatine rêzkirin.

Pêşgotina ku di serê beşa latînî de hatiye nivîsandin gellek mijaran bi carekê dihewîne. Kurşun, di pêşgotina xwe de, rave dike ku xwendina mewlûdê ne bîd'e ye, reftareke spehî ye. Piştî vê, diyar dike ku her çendî xwendina mewlûdê tevgereke spehî ye lê bi sedsalan e gellek kes ji ber guhdariya hin malikên -ku wan malikan dinivîse, nîşan dide- mewlûda Bateyî gunehan dikan. Lewre di van malikan de tiştê ku Hz. Pêxember negotî ji wî cenabî re tê îsnadkirin.<sup>125</sup> Mele Silêman, di heman cîyî de radigihîne ku ji ber ku mewlûd zimanê Kurdî parastiyê, hin kes li ber rîwayetên derew/nesehîh çavê xwe digrin. Ji ber rexneyên li ser mewlûda Bateyî em dikarin bibêjin ku ev mewlûd li hember rîwayetên çewt, derew û nesehîh bi hessasiyetekê hatiye nivîsandin. Dîsa di pêşgotinê de sedema şeweya çapê -ku herfên erebî û latînî digel hev in- hatiye ravekirin. Navên beşan bi Kurdî hatine binavkirin. Di navbera beşan de ev malika hanê ku gotina selawatan divê heye:

<sup>124</sup> Mele Silêman Kurşun, *Mewlûda Pêxember*, Weşanên Berojê, Îstanbul 2010.

<sup>125</sup> Kurşun, r.12-13.

---

“Ger divên win mehdera wî her temam  
Ser bixwînin pîrr selat û pîrr selam”

Malika pêşî ya mewlûdê bi vî awayî ye:

“Hemd û şukrê bêjimar pîrr delal  
Her ji bo perwerdekarê zu’l-Celal”

Malika dawî ya mewlûdê ev e:

“Her sena, hemd û spasên pîrr ciwan  
Tim ji me bo Zatê pakê Mihriban”

Mewlûd serê pêşî çêla xuliqandina Hz. Adem û jiyana wî hezretî dike. Nivîskar diyar dike ku ji dema pêşî ya xuliqandina mirovahiyê ve ye têkoşîn heye di navbera heq û batilê de, car caran pêxember hatine şandin. Di vê mewlûdê de ku qala rewşa Ereban a beriya Îslamê jî dike gotinê tîne ser dejerasyona exlaqî. Behsa rewşa Erebistanê, pûtperestî û eşîrparêziya wê dem û derê dike<sup>126</sup> û diyar dike tam dema ku Ereb di vê rewşa hanê de bûn Xwedê Teala Hz. Pêxember dişîne:

“Wek me go Perwerdegarê Mihriban  
Rehmeta xwe îdî şande ser cîhan”<sup>127</sup>

Mewlûda ku bêtirî vegotina jiyana Hz. Pêxember mînakan ji exlaqê wî hezretî dide, piştî beşên ku me li jorê gotî derbasî jiyana Hz. Pêxember dibe, dest bi fesla Merhebayê dike. Rîwayetên li ser mucîzeyan û têkildarê hatina Hz. Pêxember a bo dinyayê nehatine nivîsandin. Agahiyên siyerê nîn e bes di beşekê de jiyana Hz. Pêxember a heta pêxemberiyê hatiye kurtekirin.<sup>128</sup> Piştî vê, cî hatiye veqetandin bo exlaqê wî hezretî. Jixwe ji van sernavên beşan ên li jêr jî tê famkirin ku mewlûd bêtir li ser exlaqê cenabê Pêxember rawestiyaye:

- Mewlida Hz Peyxamber Armanca Afîrandina Heyînê
- Rewşa Ereban a Berî Îslamê û Pêwistiya bi Wehyê
- Merheba
- Çêbûna Wî Heyanî Peyxemberiya Wî
- Kesayetiya Wî
- Tevgera Wî bi Mal û Malbata Wî re

---

<sup>126</sup> Kurşun, r. 16-20.

<sup>127</sup> Kurşun, r. 19.

<sup>128</sup> Di beşa çaremîn a mewlûdê de kurteyek heye. Bnr. Kurşun, r. 23-25.

- 
- Tevgera Wî bi Civatê re
  - Tevgera Wî Digel Jaran
  - Tevgera Wî bi Kar û Karkeran re
  - Dilovaniya Wî
  - Dadperweriya Wî
  - Comerdiya Wî
  - Tirsaya Wî ji Xweda
  - Duayên Wî
  - Doz û Tundiya Wî ji bo Heqiyê
  - Dua

Wekî ciyawaziyeke vê mewlûdê ji mewlûdên din ev e ku beşa “Dua”yê bi awayekî helbestkî hatiye nivîsandin.

### **3.4. Mewlûda Kurdî bi Şêwaza Hedbî<sup>129</sup>**

Ji aliyê M. Burhan el-Hedbî ve hatiye nivîsandin. Tevî malikên ku gotina selawatan divên bi temamî ji 199 malikan pêk tê. Di sala 2010an de hatiye çapkirin. Navê weşanxaneyê nehate diyarkirin.

Di çapa mewlûdê de miqabilê rûpelên bi herfên erebî herfên latînî jî hene. Beriya mewlûdê pêşgotinek heye. Di ve pêşgotinê de mewlûd tê nasandin û behsa girîngiya mewlûdê tê kirin. Ji bilî vê, wek beşeke cuda beşek latînî ya 9 rûpelî jî lê hatiye zêdekirin ku tê de behsa jiyana Hz. Pêxemberê tê kirin. Li aliyê bergê bi herfên Erebi, beşeke ku ji neh rûpelan pêk tê û pêxemberê me dide nasîn heye. Îca li vir hem heyata wî cenabî hem exlaqê wî hem jî agahiyên li ser merivên wî tê qalkirin. Hem di nav rûpelekê de agahiyên kronolojîk hatine pêşkeşkirin.

Mewlûd bi zimanekî sade û xwerû hatiye nivîsandin. Lê beş nehate binavkirin. Di nav beşan de ev malik hene ku gotina selawatan divên:

“Ger dixwazin hûn Xwedê kêfxweş bikin  
Hûn selatan li Muhemmed geş bikin”

---

<sup>129</sup> M. Burhan el-Hedbî, *Mewlûda Kurdî bi Şêwaza Hedbî*, 2010.

Malikên pêşî yên mewlûdê bi vî rengî ne:

“Her bi navê ew Xwedayê Zu’l-Celal  
Tim bi navê ew Xwedayê bê zewal

Dest bi her kar û şolan ez dikim  
We bi fermana resûl agah dikim”

Malika dawî ya mewlûdê jî ev e:

“Bû Muhammed ew ji tovrindê gelan  
Yekî wek wî nayê rûkala cîhan”

Piştî Tewhîd û Selawatê, mewlûd bi mijara afirandinê dest pê dike. Di mewlûdê de ji bo rîwayetên veguhastî, carinan çavkanî jî hatine dayîn. Lê belê di beşa afirandina Hz. Adem de jêder nehatiye nîşankirin. Li gorî mewlûdê ji bo [babeta] afirandina Hz. Adem, bi rêzê Cebraîl, Mikaîl û Îsrafil hatine şandin bo dinyayê; ax giriyaye û ketiye fikaran ji ber isyan û raperîna mirovên ku dê ji xwe (ji axê) bêne xuliqandin; Cebraîl jî xemgîn bûye bo vê rewşê, lewma bêyî ku axê bîne veqeriyaye. Mikaîl û Îsrafil ku piştî Cebraîl hatibûn şandin lê ew jî bêyî ku axê rahêjin destvala veqeriyane; dawîya dawî Ezraîl hatiye şandin bo dinyayê û wî ji gellek ciyên cuda yên li dinyayê ax aniye û ji ber vê qewamê, karê/peywira ruhîstîniya mirovan hatiye dayîn bo Ezraîlî. Nivîskar ji bo vê rîwayetê çavkanî nîşan nedaye.<sup>130</sup>

Dîsa di eynî ciyê de tê gotin ku tamamê melekan secde birine Hz. Adem lê Azazîlî neçûye secdeyê; û tê ragihandin ku Azazîl, Hz. Adem û Hewwa xapandine.<sup>131</sup> Piştî vê ji bo jiyana dinyayê ya Hz. Adem û malbata wî cî hatiye veqetandin, li vê derê wekî cudahiyekek ji mewlûdên din çêla cînayeta yekem hatiye kirin.<sup>132</sup>

Di vê mewlûdê de tê ragihandin ku piştî Hz. Adem jî şandina pêxemberan dewam kiriye; û tê de navên pêxemberên ku heta Nebî Îsa hatine şandin, hatine rêzkirin/dayîn.<sup>133</sup> Piştî vê nivîskar cî daye beşên li ser cenabê Pêxember (esm). Îca divê ev ciyên hanê bi baldarî jî werin xwendin, ji ber egera ku rîwayet zêde ne û car caran ders û şîretên li ser mijarê têne dayîn û gellek dua hene û salox têne kirin. Ji lewre şopandina mijarê zehmet dibe.

<sup>130</sup> Hedbî, r. 5.

<sup>131</sup> Hedbî, r. 5.

<sup>132</sup> Hedbî, r. 6.

<sup>133</sup> Bnr Hedbî, r. 7.

Li vê derê piştî hejmartin û [rêzkirina] bapîrên cenabê Pêxember (esm) behsa zewaca bavê Nebî (esm) Abdullah û diya wî Amîne heye. Li pey wefata Abdullahî, heyama ducaniya Amîneyê tê vegotin. Nivîskar dûre, derbasî beşa “Merheba”yê û herî dawî jî derbasî beşa “dua”yê dibe û mewlûdê bi vî awayî diqedîne.<sup>134</sup>

### 3.5. Durra Birinci Mewluda Kurmancî

Ji aliyê Muhammed Siracuddînê kurê Mele Abdulhekîmê Xelîlî ve hatiye nivîsandin. Ji bo vê gotarê du nusxeyên mewlûdê -ku yek elektronîk û ya din çapkirî ye- hat bikaranîn. Ji ber ku di nusxeya elektronîk de hin malik kêman in, di vê beşê de nusxeya çapkirî wekî esas hat qebûl kirin. Ev nusxeya ji alî Weşanxaneyê Duayê ve hatiye çapkirin, 23 rûpel e. Mele Abdullahê Botî ev nusxe ji berê girtiye. Di pêşgotinê de Mele Abdullahê Botî derheqê pergala mewlûdê de agahiyên dide û diyar dike ku wî, ev nusxe ji ber destnivîseke nivîskarê mewlûdê girtiye û bêjeyên ku ne bi dilê wî bûne guherandine.

Mewlûda Kurmancî tevî ku ji hinek aliyan ve mewlûda Bateyî bi bîr dixê, ji ber ku cî dane taybetmendiyên exlaqî, beşerî û fîzîkî yên cenabê Pêxember, xweserî û resenî bi dest xistiye.

Mewlûd ji 16 beşan pêk tê. Di her beşê de 10 malik hene û digel malikên ku gotina selawatan divên malikên mewlûdê digihêje 178 malikan. Ji ber ku her beş ji 10 malikan pêk tê, heman mijar di beşa lipey de dewam dike. Beş nehatine binavkirin. Di navbera beşan de ev malik hene:

“Ey gelê guhdarê Mewlûda Nebî  
Rehmeta Heq li ser rûhê we bî

Qet nekin vala devê xwe ji selewat  
Da Xweda her we biparêze ji şewat

Ya Îlahî sed selat û sed selam  
Tû bide her dem li fexrê xas û ‘am”

Malika pêşî ya mewlûdê bi vî awayî ye:

“Piştê hemdê bêqiyas û bêded

<sup>134</sup> Bnr Hedbî, r. 7-12.

---

Bo Xwedayê Wahid û Ferd û Semed

Ew Xwedayê pir li me ni'met kirî

Ehmedê hadî li me xil'et kirî”

Malika dawî ya mewlûdê ev e:

“Teyrekî sipî çengê xwe ser min re bir

Hingê bibû Ehmedê min sed şukur”

Piştî beşa Tewhîd û Selawatê di beşa duyem de sedema nivîsandina mewlûdê hatiye vegotin. Nivîskar di beşa sêyem de pesnê cenabê Pêxember dide. Di beşên çarem, pêncem, şeşem û heftem de qala şemaîla Pêxember dike; cî dide exlaqê Pêxemberê me û behsa mûcîzeyên wî cenabî dike.

Di beşa heştan de kurteya jiyana cenabê Pêxember a bi piştî 25 saliya wî heye. Nivîskarê mewlûdê di beşa nehan de behsa girîngiya gotina selawatê dike û radigihîne ku cenabê Pêxember ji bo her selawatî tê agahdarkirin. Di beşa dehem de girîngiya mewlûdê tê qisetkîrin û tê vegotin ku dayîna mewlûdê dê bibe wesîleya şefaetê, bereketê û hatina melean bo ciyê ku mewlûd tê xwendin.

Di beşa yazdehem de nivîskar, ji Ednan heya Ebdullahî bapîrê Hz. Pêxember dijmêre û rêz dike; di beşên duwazdeh, sêzdeh û çardehem de îfade dike ku Amîne di dema ducaniyê de her meh ji aliyê pêxemberekî ve hatiye mizgînkirin; û Amîneyê di wê heyamê de wekî din jî gellek nîşane dîtine. Û piştî vê, mînak ji mûcîzeyên li ser welidîna cenabê Pêxember dide. Vegotina li ser welidîna Pêxemberê me; û rîwayetên derheqê vê beşê dirûvê mewlûda Bateyî dide.

Beşa pazdehem a mewlûdê fesla “merheba”yê ye. Lê li vê derê dêvila merhebayê gotina “Xweş bi xêr hat” hatiye bikaranîn. Piştî vê beşê beşa “dua”yê tê û mewlûd bi vî awayî diqede.

### **3.6. Mewlida Pêxember**

Navê mewlidê li ser bergê *Mewlida Nebewî*, piştî bergê di rûpela yekê de bi “Mewlida Pêxember Resûlê Bêhember” hatiye nivîsîn. Berhem, di 2009an de li Îstambul-Stenbolê çap

bûye. Navê nivîskarî di rûpela yekê de bi “Feyzullah Xaznewî Xizmetkarê Ma’newî” hatiye nivîsandin lê di rûpela dawî de tenê Feyzullah<sup>135</sup> û nimera telefona wî heye.

*Mewlida Nebewî* ji 410 malikan pêk tê. Ev mewlûd, bi hemî taybetiyên xwe ve mewlûdeke gelek cûda ye. Nivîskar, mewlûda xwe wiha dinasîne:

“Ev mewlid, ji kehniya wehyê hatiye ristîn; bi ayetên Qur’anê hatiye neqîşandin û bi hedîsên Pêxember (a.s.m) ji Sehîhê Buxarî hatiye xemilandin.”<sup>136</sup>

Dema xwîner-mewlûdxwên, dest bi xwendina vê mewlûdê bike, dê bala wî li pirbûna ayet û hedîsan bikeve. Belê ji destpêkê heta dawiyê di her rûpelî de ayet û hedîs hene. Ji bil van ji bo rûpelsaziyê jî ayet hatine bikaranîn. Di ser û binê her rûpelê de ayet hene.

Di mewlûdê de Fesla Merhabayê tune ye. Cudahiyekê din jî derbasbûna navbera beşan e. Di nava beşan de ayet hene û malikên selewatan mîna mewlûdên din di nava beşan de nîn in, di dawiyê beşan de hatine nivîsandin. Malikên selewatan wiha ne:

Hed bû li ser me selat  
Da xweş bibe ev civat  
Sallî Rabbî we sellîm  
Ala’l-Enqa’l-Muallim  
Esselatu we’s-Selam  
Ala Resuli’l-Îslam<sup>137</sup>

Cudahiyekê din jî destpêka beşan e. Di destpêka her beşê de “Besmeleyekê cuda hatiye nivîsîn:

Beşa Yekem:	Bîsmîllah ê bê zewal	Rebbê dil û can û mal
Beşa Duyem:	Bîsmîllahî’l-Muyessîr	Yê dabûnê nûr û sir
Beşa Sêyem:	Bîsmî’s-Semî’îl-Besîr	Nî’mê’l-Mewla we’n-Nesîr
Beşa Çarem:	Bîsmî Rabbî’s-Semawat	Li ser Ehmed Salawat
Beşa Pêncem:	Bîsmî’l-Wedûdî’s-Semed	Yê Qur’an da Muhemmed <sup>138</sup>
Beşa Şeşem:	Bîsmî’s-Sebûrî’s-Şekûr	Yê da Ehmed nûr û şûr.
Beşa Heftemîn:	Bîsmî’l-Meliki’l-Ekber	Yê da Nûra Pêxember

<sup>135</sup> *Mewlida Nebewî*, r.48.

<sup>136</sup> *Mewlida Nebewî*, r. 47.

<sup>137</sup> Nîşe: Di malika ewil de ev beyt zêde ye: “Ji dil bêjin seraser/Selawat ser pêxember”. Bnr *Mewlida Pêxember*, r. 12.

<sup>138</sup> Di beşa pêncemîn de cudahiyek heye: Di beriya Besmeleyê de hevokê ji ayetekê Qur’anê heye.



Beşa Heştemîn: Bîsmîllahî'l-Mudebbir Wî tenê navê Heq bir  
 Beşa Nehemîn: Bîsmîllahî'l-Muheymîn Bêjin ya rast li pey min La Îlahe  
 Îllallah Muhammed Resûlullah  
 Beşa Dehemîn: Bîsmîllahî'l-Hennanî'l-Mennan Xafirî'z-zenbî we'd-  
 Deyyan<sup>139</sup>

Rêbaza/metoda mewlûdê jî cuda ye. Mewlûd bi berfirehî, li ser jiyana pêxember nasekine. Her çiqas di beytan de îşaretî jiyana wî, sehabiyên wî, bav û kalên wî dibe lê armanca nivîskêr şîret û waz û di'a ye. Beriya mewlûdê duayeke erebî heye. Di binê duaya Erebi de ev rêz hene:

Behwer<sup>140</sup> bikin tê mirin  
 Pirs û hesab tê kirin  
 Ya qenca, cennet e war  
 Ya pîsa "Bi'se'l-Qerar"  
 Dost û dil şake bi dîn  
 "We kun mine's-sacidîn"<sup>141</sup>

Piştî van rêzan mijarên giringiya hatina pêxember li ser dinê, giringiya kelfmeya tewhîdê dane.<sup>142</sup> Nivîskêr derheqê terbiyeyê de jî hin tişt nivîsandine, di dawiya nivîsa xwe de li ser mijara terbiyeyê helbestek bi erebî jî nivîsandiye.<sup>143</sup>

Di rûpela şeşan de li ser niyetê û sidq-rastiyê sekiniye. Di dawiya mijara niyetê de li ser niyeta mewlûdê jî hin tiştan dibêje û ji bo mewlûdê jî niyetek nivîsandiye:

"Ya Rebbê Alemê! Ya Padişahê Keremê! Me niyet e em vê mewlidê bidin ji bo em rastiya "Eşhedu en la ilahe illallah we eşhedu enne Muhammeden ebduhû we Resûluhû"yê qewîn û taze bikin, Ya Rebbê Heq! Tu ji bo razîbûna xwe bigerînî. Amîn".<sup>144</sup>

Piştî vê niyetê li ser mijara sidqê hedisek û kurmanciya vê hedisê heye. Li dûv vê mijarê bi qasî du rûpelan wek destpêka mewlûdê dibaceyek heye. Piştî dibaceyê derheqê giringiya guhdarîkirinê de hin ayet hene. Piştî van ayetan mewlûd dest pê dike.

<sup>139</sup> Di çend beşan de, di beyta dawîn de "Ûyyake ne'budu" heye. (r. 13, 15, 18, 26, 30, 32)

<sup>140</sup> Bawer bikin

<sup>141</sup> *Mewlida Nebewî*, r. 2.

<sup>142</sup> *Mewlida Nebewî*, r. 3-4.

<sup>143</sup> *Mewlida Nebewî*, r. 4-5

<sup>144</sup> *Mewlida Nebewî*, r. 7.

Ji van agahiyan tê femkirin ku nivîskar li ser şîret û we'zan pir disekine ji ber vê ji bo her mijarê ayet an jî hedîs dane.

Naveroka mewlûdê beş bi beş bi vê awê ye:

Mewlûd bi tekbr û Besmeleyê dest pê dike, di beytên ewil de li ser mijarên hatina pêxember û girîngiya wî ji bo însanan disekine. Ev beş bi ayetekê bi dawî dibe.<sup>145</sup> Di dawiya beşa yekemîn de li ser tewhîdê û girîngiya tewhîdê disekine.

Di beşa duyemîn de li ser bav û kalên/ceddên pêxember disekine.<sup>146</sup>

Beşa sêyemîn derheqê çêbûna Hz. Pêxember, nebîtiya wî û peyama wî de ye.<sup>147</sup>

Di nava beşa sêyemîn û çaremîn de weke bêhnvedanê hin mijar danîne. Li vir li ser nesla Hz. Pêxember û li ser sala hatina wî cenabî ya li dinyayê mijarek daniye. Wek me got ev her du mijar ji bo guhdarvanan weke cihên bêhnvedanê ne.<sup>148</sup>

Piştî mewlûdê nivîskêr, di navbera rûpela 37 û 47an de li ser mijarên cuda rawestiyaye. Nivîskêr, mijar bi ayet û hedîsan vegotîne. Ji bil mijaran hin helbestên bi Erebi û Kurmancî û ji bo mewlûdê bi erebî diayeke dinê jî heye.

Di rûpela 47-48an de bi deh maddeyan bi gotina nivîskêr “Şert û Te’lîmatên Dana Mewlidê” hatine nivîsandin.

Mewlûdên ku li gorî tesbîtên me di van salên dawî de hatine nivîsandin û xwediyê rêbazine cuda ne ji mewlûda Bateyî, ev çend in. Em cudahiya van mewlûdan a ji mewlûdên berê wisa derdixin ku rîwayetên wan cuda ne û mijarên ku jê behs dikin jî cuda ne. Wekî ku tê zanîn bûyerên têkildarê bi welidîna Hz. Pêxember re mijara bingehîn a mewlûdan e lê belê tevî vê, yekcaran di mewlûdan de mijarên dîtir jî hatine vegotin. Pêkan e ku em van mijaran bi gelemperî dabeşî heft qîsman bikin: 1- Nûra Muhammedî 2- Welidîna Hz. Pêxember û qewamên ku bi welidîna wî cenabî re têkildar in 3- Jiyana Hz. Pêxember 4- Şemaîl û exlaqê wî cenabî 5- Peyama Îlahî ku Qasidê Xwedê anîtiye 6- Hezkirina Pêxember 7- Pesn.<sup>149</sup>

<sup>145</sup> Di vê beşê de cudahiyeke heye. Ew jî dabeşkirina beşê ye. Di nava beşê de ayetek hatiye danîn. Piştî ayetê beş dîsa didome. Bnr. *Mewlîda Nebewî*, r. 11.

<sup>146</sup> *Mewlîda Nebewî*, r. 13-15.

<sup>147</sup> *Mewlîda Nebewî*, r. 15- 18.

<sup>148</sup> *Mewlîda Nebewî*, r.18-19.

<sup>149</sup> Çağmar, bnb, r.15-17.

Li wan mewlûdên ku bi bandora mewlûda Bateyî hatine nivîsandin, behsa sê mijarên dawî nehatine kirin. Ev mewlûd bi giştî, bêtir li ser du yan sê mijarên pêşî rawestiyane. Lê di hinek mewlûdên dema me de bêtirî ji du mijarên pêşî, li ser mijarên din hatine rawestandin. Di mewlûda Nezma Şîrîn de jiyana Hz. Pêxember tê qisetkirin lê di mewlûda Mele Suleyman Kurşun de exlaqê Hz. Pêxember bêtir li pêş e. Ji aliye nivîskarên van her du mewlûdan ve hatiye îfadekirin ku wan, mewlûdên xwe bi fikara nivîsandina mewlûdeke jêdersehîh amade kirine.

Gellek girîng e ku mewlûdên ku di vê dawiyê de nivîsandî bi fikar û hessasiyetên navborî hatine nivîsandin. Lewre lidarxistina merasîma mewlûdê bandor li têgihîştina îmaja cenabê Pêxember jî kiriye û dike. Mewlûdên ku hema hema bi her wesîleyê tînin xwendin –yên nexwende jî didin xwendin- xwediyê ciyekî girîng digrin ji bo pêkhatina îmajê Hz. Pêxember di zêhn û mêjiyan de. Ji ber vê egerê baldarî divê di neqandin û bikaranîna rîwayetan de, da ku îmajê çewt a pêxemberiyê neye pê û dernekeve.

## ENCAM

Ji sedsalên ku derketiye heta niha mewlûd, girîngiya xwe parastiyê. Li her derê ku misilman lê dijîn rewresmên mewlûdê hatine lidarxistin û ji bo ku di van rewresman de bêne xwendin bi gellek zimanan mewlûd hatine nivîsandin. Di vê gotarê de me cî dan mewlûdên Kurdiya Kurmancî; me ew vekolandin û em gihîştin van encaman:

Me tesbît kir, tevî ku nivîsandina mewlûdan di van heyamên dawî de bêtir bûne li gorî yê berê, piraniya wan di bin bandora Bateyî de mane. Lê belê tê fêmê ku mewlûdên dawîtir ên van salan xwe ji wê bandorê xelas kiriye.

Temamê nivîskarên van mewlûdan, ji medresexwînan in. Lê belê mewlûdên di vê dema dawî de tevî ku dîsa ji aliye medresexwînan ve hatine nivîsandin zimanekî xwerû hatiye bikaranîn û ji bo gihîştin û xîtabkirina girseyeke berfirehtir mewlûd bi herfên Erebî û Latînî digel hev tîne çapkirin.

Nivîskariya mewlûdê hê dewam dike. Gava mirov li ser sedemên vê berdehamiyê difikire du sedemên tê bîrê. Yek jê: Ji ber ku mewlûd xuyanga hezkirina cenabê Pêxember e. Ya din: Xwesteka nivîsandina mewlûdeke sehîh e ku ev helwest jî dîsa ji ber hezkirina cenabê Pêxember der tê. Ev sedema duyem di mewlûdên Nezma Şîrîn û Mewlûda Pêxember de hatine diyarkirin. Digel vê, di hin mewlûdên vê dawiyê de nivîskar bêtir bala xwe didin ser

taybetmendiyên hînkariyê. Egera herî girîng a vê yekê ji ber armanceke sereke ya van mewlûdan e: Hînkirina agahiyên Siyer û exlaqê.

Divê mirov dêhna xwe bide ku çavkaniya dînî ya herî girîng a nexwende û nenûsên vê herêmê “mewlûd” e. Ji ber ku dîndariya gel, bêtir meyildarê motîfên derasayî ye, di fama dîndariyê de mucîze, di pozîsyoneke navendî de cî digrin. Wekî ku Îbnî Xaldûn diyarkirî, ji ber egera ku nefsa mirov pir zêde eleqa xwe dide ser mubalexe, pirole û derasayiyê,<sup>150</sup> di nav misilmanan de jî rîwayetên ku mijarên derasayî vedibêjin ji yê din bêtir rexbet dîtine û hatine ecibandin. Di vê rewşê de divê meriv ji bo ku modela sehîh a pêxember pêk were di bijartina mewlûdê de baldar be.

Tevî ku di mewlûdên nuh de şîretên exlaqî bêtir in, gel herî zêde girîngiyê dide mucîzeyan û rîwayetên derasayî. Îca ji ber vê, ya muhîm ne ev e ku hemû mucîze bên deranîn, di bikaranîna rîwayetan de baldarî divê. Zêdehî û piroletiya li ser rîwayetên mucîzeyan dibe sedema derketina piroletiyeke din ku temamê rîwayetên li ser mucîzeyan têne redkirin. Mijara deranîna mucîzeyan ji mewlûdan jî, dê pirsra kêmbûna bandora mewlûdan a li ser guhdêran bîne rojevê. Nexwe divê mewlûda ku bi sedsalan e tê xwendin û nerîta/tradisyona wê ya ku dibe sedema civîna mirovan bê domandin lê li ser rîwayetên bi vî rengî jî bê dîqetkirin.

### ÇAVKANÎ

Wergera *Qur'ana Pîroz Bi Zimanê Kurdi*, M. Huseyn Êsî, M. Se'îd Girdarî, M. Muhammed Bêrkevanî, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2012.

el-Amidi, Muhammed Mehdi, *Mewlida Kurmanci Muhtasar Mevlid-i Nebi Aleyhisselatuveselam*, cih û dîroka çapê tunene.

el-Amidi, Zeynelabidin, *Behcetü'l En'am Bişerhi Mevlidi'n-Nebi Aleyhisselatuveselam*, cih û dîroka çapê tunene.

Aymutlu, Ahmed, *Süleyman Çelebi ve Mevlid-i Şerif*, Weşanên Milli Eğitim Bakanlığı, İstanbul 1995.

Bakırcı, Selami *Mevlid Doğuşu Ve Gelişmesi*, Weşanên Akademik Araştırmalarê, İstanbul 2003.

Bateyî, Molla Hüseyin, *Mevlid-i Nebi*, Ayfa Basım Yayın, cih û dîroka çapê tunene.

Çağmar, M. Edip, *Edebi Açıdan Arapça Mevlidler*, Weşanên İlahiyatê, Ankara 2004.

Feyzullah Xaznewî, *Mewlida Pêxember*, İstanbul 2009.

Fudeylî, Mela Muhammed Ali, *Mewluda Şerif*, nusxeya destxetê.

<sup>150</sup> Muhammed b. Abdurrahman İbnî Haldun, *Mukaddime*, Wergêr: Halil Kendir, Ankara 2004, c.I, r.34.

El-Halili, Molla Abdulhakim oğlu Muhammed Siracuddin, *Mevlid-i Şerif Durra Birinci Mewlûda Kurmanci*, Weşanxaneyê Duayê, İstanbul 2009.

İbni Haldun, Muhammed b. Abdurrahman, *Mukaddime*, Wergêr: Halil Kendir, Ankara 2004, c.I.

Haydarî, Muhammed Emin, *Mevlid-i Nebi*, Ayfa Basım Yayın, cih û dîroka çapê tunene.

Kardeşlik, M. Zahit, *Mevlûd-i Şerif*, cih û dîroka çapê tunene.

el-Kufsurî, Es-Seyyid Bedreddin İbni Molla Salih el-Hüseyni eş-Şafii, *Mewlûda Kurdî Bi Zimanê Gundî*, Weşanên Nûbiharê, İstanbul.

El-Mardini el-Muhaciri, Molla Ali bin es-Seyyid Abdurrahman, *Ava Heyat*, Amadekarê Çapê: Abdusselam Bêcirmanî, Mersin, Dîroka çapê tune.

Maoluf, Lewis, *El-Müncid Fi'l-Luğa*, Beyrut 1973.

Pekolcay, Necla, *Mevlid*, Weşanên Türkiye Diyanet Vakfıyê, Ankara 1993.

Okiç, M.Tayyib, “Çeşitli Dillerde Mevlidler ve Süleyman Çelebi Mevlidinin Tercemeleri”, *Atatürk Üniversitesi İslami İlimler Fakültesi Dergisi*, hejmar: 1, Erzurum 1975.

Şengün, Necdet, “Hz Fatıma Mevlidi ve Vesiletü'n-Necat İle Mukayesesi”; *Cumhuriyet Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, c.XII herjmar 2.

*Türk Dili Edebiyatı Ansiklopedisi (Devirler, İsimler, Eserler, Terimler)*, Weşanên Dergâhê, İstanbul 1986, c.VI.

Şeker, Mehmet, “Mevlit”, *Diyanet İslam Ansiklopedisi*, c.XXIX, Ankara 2004.

*MEB İslam Ansiklopedisi*, Çapxaneyê Milli Eğitimê, İstanbul 1967, c.VI.

M. Mustafa yê Melâ Aliyê Êzdarî, *Mewlûda Şerif Ji Ewwel Heta Axir Rehberê Xelâsî Hz Muhammed (S.A.V)*, Weşanên İhsanê, İstanbul, Tebax 2005.

Kurşun, Mela Silêman, *Mewlida Pêxember*, Weşanên Berojê, İstanbul 2010.

Sadinî, M. Xalid, *Mela Huseynê Bateyî Jiyan, Berhem Ê Helbestên Wi*, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2010.